Evdirrehim Rehmi Hekkari, as an author and intellectual, had a great influence on Kurdish literature. He has published his writings in several magazines and newspapers, such as *Jin*, *Serbestî* and *Ehli Sunnet*. He has also left a great number of books behind. Rehmi Hekkari is mostly known for his Kurdish poems that are published in *Jin*, and his writings in *Ehli Sunnet*. Due to the lack of information regarding all his works, many of his features remain unknown by the readers. One of the important ones, on which this research focuses, is his authorship about children, youth and women. Rehmi Hekkari has conducted many works, both in Kurdish and Turkish languages, for children and those which are written directly for his own children have very interesting side. Therefore, he has done for works for each of his four children. Apart from his own children, he also has two more works written in Turkish language dedicated to children. Also, in both magazines, *Jin* and *Gaziya Welat*, he has directly addressed to children. Indeed, the Kurdish word conjugation tables that are offered to Kurdish children and youth in *Jin* magazine have important place in the history of Kurdish literature. However, the special sides of Evdirrehim remain unknown, and in this regard, this work is aimed to introduce them so that this author gets more recognition. On the other hand, due to the wideness of context and subjects of these works, this research focuses only on Rehmi Hekkari's works that are written in Kurdish language.

Key Words: Evdirrehim Rehmi Hekkari, Intellectuality, Childen's Literature, Youth

Destpêk: Nêrînek li Edebiyata Zarokan ya Kurdî

Di edebiyata Kurdî de tarîxa berhemên ku ji bo zarok û ciwanan hatine nivîsîn heta sedsala 17ê diçît. Lewra li gor lêkolînên li ser edebiyata zarokan, metnê yekem yê edebiyata zarokan *Nûbihara Biçûkan* (1683) e. Bi vî şiklî, çawa ku li ser *Mem û Zînê* mesnewiya Kurdî dest pê diket, edebiyata zarokan jî bi berhemên Ehmedê Xanî (1651-1707) dest pê diket. Ji ber ku *Nûbihara Biçûkan* yekemîn ferhenga 'Erebî-Kurdî ye wek yekemîn berhema derbarê leksîkolojiya Kurdî de jî dihête qebûlkirin (Tek, 2018a, 7). Herwisa di metnên piştî berhemên Xanî hatine de, dîsa tesîra Xanî diyar dibit. Li ser wê jî mirov dişê bibêjît ku her

du berhemên Xanî, *Nûbihara Biçûkan* û *'Eqîdeya Îmanê* (1687), ji aliyekî ve motîvasyonêk çêkirine ku berhemên wisa di Kurdî de bihêne nivîsîn û ji aliyê dî ve jî ew bi xwe bûne kanonek ku bandorê li ser berhemên piştî xwe bikin.

Hem li ser berhemên Xanî hem jî li ser berhemên piştî wan mirov nikarî bibêjî ku di Kurdî de edebiyateke xurt ya zarokan heye. Lewra di edebiyata Kurdî de metnên ku bi muxetabiya zarokan hatine nivîsîn hebin jî, di navbera van metnan de salên dirêj derbas bûne û heta salên dawî bi Kurdî qadeke wisa ya xurt çênebûye. Helbet sebebên gelek cuda hene ka çima bingeheke serketî pêk nehatiye. Beriya her tiştî, Kurdan heta tarîxeke nêzik sazîyên girîng yê perwerdehiyê û hunerî nebûne. Yê heyî jî zêde domdirêj nebûne. Ji ber wê jî şair û rewşenbîrên civata Kurdan ji bo zarokên serdema xwe û nîşên piştî xwe - bi taybet jî ji bo zarokan- kêr berhem nivîsîne, yan yê li berdest in kêr in yan jî ji wan kêr nimûne geheştine îro. Ji aliyê dî ve jî metnên ku hatine nivîsîn jî ji edebiyata zarokan zêdetir ji bo perwerdeya zarokan in. Lewra tiştê ji metnên Kurdî derdikevîte der, perwerdekirina zarokan û berhem nivîsîna seba wî karî ji bo şairên Kurdî bûye cihê xemxwariyê. Ji ber wê jî, têgehên edebiyata zarokan û perwerdeya zarokan çiqas bi hev re têkildar e ewqas jî tevlihev dibit.

Gava mirov li metnên dî yê ji bo zarokan hatine nivîsîn dinêrît, tesîra Xanî di hîlbijartina metnan de jî xuya diket. Lewra çawa ku ji berhemên Xanî yek ferhenga menzûm e ya din eqîdename ye, di berhemên piştî Xanî dihên de jî vê nerîtê dewam kiriye. Ji wan metnan yek jî *Gulzara Ismaîlê Bazîdî* (1655-1710) ye. Ev berhema Bazîdî jî ferhengeke menzûm e ku di wê de meneya kelîmeyan bi Erebi, Farişî û Kurdî hatine dan. Bi vî şiklê ev berheme, ferhengeke sêzimanî ye.

Şêx Me'rûfê Nodeyî (1753-1837) bi navê *Luxetnamey Ehmedî* (1790) ferhengeke menzûm nivîsiye. Di vê ferhengê de jî meneya kelîmeyan bi Kurdî (Sorani) û Erebi cih digirin. Dîsa *Mîrsadu'l-Etfala* (1912) Şêx Mihemed Kerbelayî jî ferhengeke menzûm e ku di wê de jî zimanên berhemê Farişî û Kurdî ne (Tosun, 2018, 149-150). Herwisa di wê de jî tê gotin ku meqseda wê ew e ku zarokên Kurdan bikaribin Farişî fêm bikin û meneya kelîmeyan bi wî zimanî bizanibin (Işık, 2017, 75). Kerbelayî çawa ku li ser şopa Xanî berhema xwe nivîsiye herwisa di berhema xwe de behsa girîngiya nivîsîna bi zimanê Kurdî jî kiriye (Tek, 2018a, 83). Ew jî nîşan didet ku kanona ku Xanî diyar kiriye piştî wî jî dewam kiriye.

Di edebiyata zarokan ya bi Kurdî de piştî ferhengên menzûm, eqîdenameyên menzûm hatine nivîsîn. Ev nerîte jî dîsa piştî *'Eqîdenameya Ehmedê Xanî* bûye 'adet û di medresyan de wek metnên mufredatê jî hatine dîtin. Li pey *'Eqîdenameya Xanî*, 'eqîdenameyek jî ya Mewlewî (1806-1882) ye. Di vê berhemê de jî dihête gotin ku ew ji bo zarokan hatiye nivîsîn (Ehmed, 2005, 8: ji neqla Tosun, 2018, 149).

Di edebiyata zarokan de rola kovaran jî pir girîng e ku di gelek kovarên Kurdî de yan li ser mijarên edebiyata zarokan nivîs derketine yan jî kovaran hin rûpel ji vê mijarê re terxan kirine. Lê rasterast kovarên ji bo zarokan hatine damezirandin û bi vî şiklî belavbûyî jî hene. Yeki ji wan jî kovara *Kepirê* ye ku bi salan li Dihokê bi piştevaniya dezgehê Spîrêzê derketiye. Kovara *Kepirê* hem bi awayê rengîn û çapeke baş hem jî ji aliyê naverokê ve nêzikê jiyana zarokan e ku ew bi du zaravayan (Sorani-Kurmanci) hem bi tîpên Sorani hem jî yên Latîni derdikevît. Dîsa her bi piştevaniya Spîrêzê kovara *Ciwan* jî divê mirov behsê jê biket ku ew kovara werzişê ye ku ji bo jin, ciwan û nûciwanan derdikevît.²

Di tarîxa Kurdî de herçiqas hejmara wan zêde nebin jî kovarên ji bo zarokan hatine derxistin têne dîtin. Yek ji wan kovaran jî *Girr û Gallî Mindallanî Kurd* e ku ew ji aliyê rola wê û girîngiya tarîxî ve gelek balkêş e. *Girr û Gallî Mindallanî Kurd* kovareke taybet ji bo zarokan e ku ew bi piştevaniya Komara Mehabadê derketiye. Kenan Subaşı li ser vê kovarê lêkolînek kiriye û sê jimarên wê ji Sorani bo Kurmanci wergerandine û metnên wan jimarên jî wek faksîmîle di dawîya xebata xwe de dane (Subaşı, 2018, 137-183). Ew kovara zarokan jî aliyê tarîxîbûna xwe zêdetir, girîngiya wê ya resmîbûnê ve girêdaye. Lewra mirov dikarî ji wê xebatê bigehe encamekê ku ka di zihna Kurdan de paradîgmayeke çawa derbarê xebatên edebiyata zarokan de heye? Di vê kovarê de navdarên wekî Mela Qadirê Muderrisi (1902-1992), Hêjar Mukriyanî (1920-1991) û Hêmin Mukriyanî (1920-1986) jî wek nivîskar têne dîtin û ji vî alî ve jî rola wê kovarê muhim e û divê di xebatên li ser edebiyata zarokan de cihê wê bête diyarkirin.

Bêguman navê balkêş ku ji bo zarokan di serdema modern de berhem nivîsiye M. Emin Bozarslan e. Bozarslan, herçiqas zêdetir bi xebatên xwe yên ilmî bihête nasîn jî, rola wî di edebiyata zarokan ya bi Kurdî de gelek muhim e. Berhema wî ya ewil ku ji bo zarokan derbarê alfabeya Kurdî de ye. *Alfabe* di sala 1968ê li Stenbolê hatiye çapkirin û di sala 1980yê li Swêdê-Borasê jî nû ve hatiye çapkirin (Bozarslan 1968; Ekinci, 2016, 16). Li gor agahiyên di dawîya *Meyro* de dihêne dan, ev berhem bi mebesta fêrkirina alfabeya Latîni-Kurdî hatiye nivîsin ku li ser bergê berhemê jî du zarok (yek kur yek jî keç) bi alfabeya Latîni herfan dinivîsin û rêzikan dixwûnin (Bozarslan, 1981a, 77). Dîsa di rûpelên dawî yên *Meyro* de reklama du berhemên Bozarslan tê kirin ku ew “di nêz da derdikev[in].” Ji wan yek *Mir Zoro* ye yek jî *Gurê Bilûrvan* e ku di binê sernavê her du berheman de jî ev îbare heye: “(Pirtûka Zarûkan).” Di *Mir Zoro* de 12 metelokên Kurdî digel wêneyên taybet yên ji bo wan berheman hatine çêkirin cih digirin. Herwisa di *Gurê Bilûrvan* de jî 6 metelok bi vî awayî hene. Ji bo van her du berheman jî tê gotin ku dê ew berhem xwendekarên xwe hem bidene kenîn hem jî wan kur û dût bifikirînin (Bozarslan, 1981a, 78-79; Bozarslan, 2000).

² Ji bo zêdetir agahiyên derbareyê kovarên *Kepir* û *Ciwanê* bnr. (www.spirez.net û www.spirez.org).

Pirtûka Bozarslan ya balkêş *Meyro* jî di sala 1979ê de derdikevî û paşî jî di 1981ê de li Borasê dihête weşandin (Bozarslan, 1979; Bozarslan, 2000, 121). Di vê berhemê de 10 kurteçîrok hene ku di wan de mekan, leheng û navên wan Kurdewar in. Taybetiya di motivasyona Bozarslan de bala mirovî dikêşî û wî hinekê nêzîkê Evdîrrehîm Rehmî diket, pêşkêşkirina *Meyroyê* ye ku wî ew bo kurê xwe nivîsiye. Ji ithafa *Meyro* mirov agahdar dibit ku kurê wî, Ganî Bozarslan di tarîxa 10.05.1978ê dihête kuştin û ew jî 15.11.1978ê de *Meyroyê* jî bo bîranîna kurê xwe tamam diket (Bozarslan, 1981a, 5). Yanî M. Emin Bozarslan di navbera 5-6 mehan de, *Meyroyê* bi zimanê Kurdî amade diket. Ji ber wê motivasyonê û tesîra êşa kurê xwe bi zimanê xwe berhemekê bo zarokan dinivîsît. Ew jî nîşan didet ku rewşenbîreke Kurd li ser birîna xwe ya bavbûnê jî bo hemû zarokên Kurdan bi zimanê wan berhemana dinivîsît. Li ser vê yekê mirov dişê bibêjît ku *Meyro*, di tarîxa edebiyata zarokan de xwedî cihekî girîng e. Lewra Bozarslan piştî vê pirtûkê nêzîkê bîst berhemên cuda yên ji bo zarokan nivîsîne, belav kirine. Divêt nehête jibîrkin ku ev tesbîten me li ser xwendina metna wî ye. Ne ku rasterast nivîskarê wê berhemê derdibire ku wî ew jî ber kuştina kurê xwe nivîsiye. Lê bi ya me, wê yekê tesîr li ser nivîskarî kiriye ku wî berê xwe daye nivîsîna berhemeke wisa.

Berhemên ku M. Emin Bozarslan jî bo zarokan nivîsîne (li gor kronolojiya wan ya çapa ewil) eve ne: *Alfabe* (1968), *Meyro* (1979), *Mîr Zoro* (1981b), *Gurê Bîlûrvan* (1982a), *Kêz Xatûn* (1982b), *Serketîna Mîşkan* (1984), *Pepûk* (1985), *Masiyên Beji* (1987)³, *Jî Dinan Dintir* (1988)⁴, *Ilmê Tûrk* (1989), *Bûka Gulsûn* (1990), *Mela Kuli* (1991), *Guli Xatûn* (1997), *Kurê Mirê Masiyan* (1998), *Keçika Darin* (1999a), *Keçika Qırşîroş* (1999b), *Ditinhezar* (2000), *Gulê û Sino* (2002).

Bi vî awayî M. Emin Bozarslan jî *Alfabe* û *Meyroyê* heta *Gulê û Sino* di Kurdî de bi istiqrareke serkeftî literaturek ava kiriye. Bi taybetî di navbera salên 1980-1990an de nivîsîn, çapkirin û belavkirina berhemên Kurdî zêde ne pêş de bû û zarok li aliyekê, xwûnerên mezin jî peyda nedibûn. Lê di van salan de, Bozarslan jî bo zarokan pirtûk nivîsîne û çap kirine.⁵ Ji ber wan berhemên Bozarslan, mirov dikarî edebiyata Kurdî ya piştî salên 1980yê jî bo edebiyata zarokan wek dewreke bi bereket bi nav biket.⁶

³ Di jenerîka çapa duyem ya *Masiyên Beji* de jî bo çapa ewil tarîxa 1985an nivîsiye. Lê di biyografiya M. Emin Bozarslan de (di heman pirtûkê de jî) 1987 nivîsiye (Bozarslan 2007, 184). Loma me jî tarîxa çapa ewil ya wê berhemê wek 1987 nivîsî.

⁴ Dîsa di jenerîka çapa duyem ya *Jî Dinan Dintir* de jî bo çapa ewil tarîxa 1987an nivîsiye. Lê di biyografiya M. Emin Bozarslan de (di heman pirtûkê de jî) 1988 nivîsiye (Bozarslan 2009, 160). Loma me jî tarîxa çapa ewil ya wê berhemê wek 1988 nivîsî.

⁵ Ji bo zêdetir agahiyên li ser naveroka hin berhemên M. Emin Bozarslan yên ji bo zarokan nivîsîne bnr. (Ekinci 2016)

⁶ Helbet di Kurdî de mirov dikarî behsa wergerên ji pirtûkên nivîskarên navdar yên di warê edebiyata zarokan de û heta wergera helbest û çîrokan jî biket. Lê di çarçoveya edebiyata zarokan de bi Kurdî çî hatiye kirin, lêpirsîna vê nivîsê nîne. Lewra mijara sereke ya vê nivîsê tenê berhemên Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî ne. Loma, berhemên beriya Rehmî Hekkarî ên di vê qadê de û ihtimala tesîra wan ya li ser berhemên Hekkarî, jî bo vê gotarê ciheke girîng digirît. Lê berhemên piştî wî hatine nivîsîn ji niyeta

I. Rehmî Hekkarî û Berhemên Wî yên bo Zarok, Ciwan û Jinan

Wek me li jor jî gotî, di derbarê edebiyata zarokan de berhema sereke *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî tê qebûlkirin. Ji ber wê jî tesîra Xanî di edebiyata Kurdî de her tim dewam kiriye. Çawa ku Ehmedê Xanî ew berhem nivîsîne, çend Kurdên piştî serdama Xanî hatî, li ser heman xetê berhem dane. Ji wan jî yek Evdirrehîm Rehmî Hekkarî (1890-1958) ye ku wî hem jî bo zarokan hem jî bo ciwanan hem jî ji bo jinan/dayikan berhem nivîsîne. Lê ferqa Evdirrehîm Rehmî Hekkarî ev e ku wî ne tenê bi Kurdî nivîsîne. Wekî dî, wî ew berhem ji şairekî zêdetir wek îdeologekî nivîsîne. Ji ber wê yekê, divêt ew pirsên li jorê hem jî bo metnên Xanî hem jî ji bo yên Rehmî Hekkarî bêne pirsîn ku ka ew berhem aîdê edebiyata zarokan in yan ne? Lê çawa di serdema Xanî de muxatebên ferhengên pîrzimanî zarok bûn û ew berhem jî bo zarokan dihatine nivîsîn, di serdema Rehmî Hekkarî de jî her wekî xebatên Xanî dihatine nivîsîn. Loma divêt berhemên wî li gor serdema wî û modaya wê serdemê bêne dîtin û analîzkirin.⁷

Rehmî Hekkarî ji ber ku di serdemeke wisa de jiyabû ku îdeolojî, ji edebiyat û hunerê pêşdatir bû. Herwisa karê nivîskariyê jî enstrumanek bû ji bo îdeolojiyan. Ji ber hindê wî bi xwe jî qelemê xwe di xizmeta dîndarî û Kurdewariyê de bi kar diîna. Di encama vê yekê de jî helbest û hunera Rehmî Hekkarî ji aliyekî ve şewazeke nû li edebiyata Kurdî zêde kiriye. Lê ji aliyê dî ve jî bûye sebeb ku hunera wî hin caran jî mebest û hêzeka estetîk dûr bikevît. Feqet her çawa be, di encama xebatên Rehmî Hekkarî de hêbetek berhem mane ku Kurd bişên li ser wan xebatên nû însa bikin. Bo nimûne, Rehmî Hekkarî cara ewil metnê piyesa/tiyatroya Kurdî nivîsiye ku tarîxa wê mijarê bi xwe daye destpêkirin. Ji ber wê, Rehmî Hekkarî ne tenê di şanoyê de, herwisa di gelek babetên dî de jî bûye rewşenbîrekî pêşeng. Di nav van babetan de jî ya herî muhim ev e ku wî pûtahiyeke mezin daye perwerde û exlaqê ciwanan û ji bo wan berhem telîf kirine.

Rehmî Hekkarî wekî rewşenbîrên dî yên serdema xwe, ji bo xilasiya Kurdan “Kurdewariyeke dîndarane” yan jî “dîndariyeke Kurdewar” hizir kiriye. Loma mirov dişê bibêjit ku ew yek ji ewiltirîn (belkî jî yekemîn) dîndar /Îslamciyê Kurd e ku wî di serdema ewil de (beriya Cumhuriyetê) behra pitir bi Kurdî nivîsiye û Kurdewariya wî pêşdatir e. Lê piştî avabûna Cumhuriyetê jî Kurdewariya xwe paşve kêşaye û dîndariya xwe pêşve biriyê.

Ji aliyekî ve ji bo têgeheştina hizir û motîvasiyona nivîskarî û ji aliyê dî ve ji bo têgeheştina tesîra wî li ser edebiyata Kurdî (herwisa tesîra serdemê li ser wî) ew berhemên Rehmî Hekkarî girîng in. Lewra wî li Stenbola sedsala borî jî

tesbîta tesîrê zêdetir, ji bo nîşandana rewşa edebiyata zarokan ya Kurdî, di vê edebiyatê de cihê Rehmî Hekkarî û berhemê wî ye.

⁷ Niyeta vê gotarê, bertengkirin yan jî berfirehkirina têgeha “edebiyata zarokan” nîne. Yanî terîfek ji bo wê têgehê nahête kirin. Tenê berhemên Rehmî Hekkarî ên pedagojîk dihêne nasandin ku profîla wî ya nivîskarî û rewşenbîriyê bihête îşaretkirin. Loma berhemên Xanî yan jî yên Hekkarî yên pedagojîk çiqas dîkevîne nava wê edebiyatê, mijara xebatên berfirehtir in.

nivîskarekî zêdetir wek aktîvîstekî hem li ser mafên Bisirmanan hem jî li ser yên Kurdan gelek tişt nivîsîne. Ji ber wê jî têgeheştina profîla Rehmî Hekkarî de têgeheştina serdema wî jî ligel xwe bîne û di nav edebiyata Kurdî de jî cihê wî û berhemên wî yên ji bo zarokan kifş biket.

Rehmî Hekkarî berhemên xwe yên Kurdî exleb di navbera salên 1919-1922ê de nivîsîne. Yanî piştî ku komara Tirkîyê ava bûye wî êdî berhemên Kurdî neweşandine. Helbet ji berhemên wî dihête dîtin ku wî piştî van salan jî bi Kurdî nivîsiye. Lê wî nekariye wan biweşînit. Loma berhemên xwe yên Kurdî penive nivîsîne û zêdetir mesaiya xwe daye meseleyên dînî û kovara *Ehli Sünnetê*. Di nav berhemên Rehmî Hekkarî yên Kurdî de ji bilî nivîs û helbestên di kovara *Jînê* de belav bûne eve derdikevine pêş: *Memê Alan*, çar heb *Gaziya Welat*, *Eqîda Kurdan* û *Dersa Dîn*. Lê em dê di vê gotarê de tenê li ser berhemên wî yên ji bo zarok, ciwan û jinan hatine nivîsîn rawestin. Bi vî şiklî dê kifş bibe ka Rehmî Hekkarî di vê babetê de çi berhem li dûv xwe hêlane. Herwisa wî bi motîvasyonêke çawa nivîsiye û vegotina berhemên wî çawa bûye û wan çi li edebiyata Kurdî zêde kiriye.

I. I. Pirtûk

Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî, ji bo zarokan heft pirtûk bi Tirkî û sê pirtûk jî bi Kurdî nivîsîne. Ji yên Tirkî jî çar pirtûk rasterast ji bo zarokên xwe nivîsîne. Dîsa ji bo zarokên Kurdan jî sê berhemên serbixwe nivîsîne. Herwisa gelek helbest û xebatên perakende ji bo zarokan, jin û ciwanan di kovar û rojnameyan de belav kirine.

Di nav wan berhemên Tirkî hatine nivîsîn de bi taybet pirtûkên ji bo zarokên xwe nivîsîne gelek muhim in. Lewra ji bo têgeheştina nêrîna Rehmî ya derbarê zarokan û gihandina wan de ew xebat girîng in. Herwisa li ser wan berheman mirov hem dikarît îdeolojiya serdest ya wê serdemê hem jî networka îdeolojîk ya Rehmî Hekkarî fêhm biket.

Berhemên ku Rehmî Hekkarî bi Tirkî ji bo zarokan nivîsîne ev in: *Garib Çocuklara Ahlak Aşısı* (1919), *Esir Bir Çocuğun Başına Gelenler* (1334/1915), *İslam Yavrusunun Kitabı* (1956). Berhemên ku wî ji bo zarokên xwe nivîsîne jî eve ne: *Metin'in Din Soruları* (1956), *Hâle'nin Din Soruları* (1956), *Pertev'in Din Soruları* (1956), *Jâle'nin İman Kitabı*. Ev kitêbên ku ji bo zarokên xwe nivîsîne, pêşiyê yek bi yek çap dibin û paşî jî hemû bi navê *İslam Yavrusunun Kitabıyê* de wek yek berhem çap dibin.⁸

Pirtûkên ku Rehmî Hekkarî, ji bo zarokan bi Kurdî nivîsîne eve ne: *Dersa Dîn* (1921), *Kilîla (Miftêya) Xwendinê: Elîfbêya Kurdî û 'Eqîda İmanê/ 'Eqîda Kurdan*. Ji ber ku derbarê Rehmî Hekkarî de xebatên me temam nebûne û hinek

⁸ Berhemên Rehmî Hekkarî yên Tirkî ku mirov dişê wan di nav edebiyata zarokan de bi cih biket, nasnameya wî ya “nivîskarê îdeolog” xweştir nişan didin. Lê ew berhemên wî di vê gotarê de nebûne mijara sereke. Ji ber wê me tenê yên Kurdî nixandine.

berhemên wî negeheştine ber destê lêkolîneran, agahiyên derheqê berhemên wî yê ji bo zarokan nivîsîne de jî li gor zanînên niha ne. Loma tesbîtên îro dibit ku di pêşerojê de li gor agahiyên nû biguherin. Lê berhemên ku Rehmî Hekkarî telîf kirine û berdest, ew in yê ku me behsa wan kirî.

i. Dersa Dîn (Kürtçe Din Dersleri) -Li ser Mezhebê Îmam Şafî'î-

Ev kitêb di sala 1921ê de li Stenbolê hatiye çapkirin ku sernavê wê wisa ye: “*Kürtçe Din Dersleri: Dersa Dîn, Li Ser Mezhebê Îmam Şafî'î.*” Navê nivîskar jî wisa hatiye nivîsîn: “Ji mala Hekkariyan Neviyê Hacî Teyar Begê, Evdirrehîm Rehmî Ibn-i Pertew (Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew, 1921, 1-2; Tek 2018b, 847-8).” Di dawîya kitêbê de listeyeke mufredata kitêbên Kurdî heye ku ev kitêb di rêza sêyê de ye û tê de dihête nivîsîn ku ew jî bo sinifa duyan hatiye hazirkirin. Di kitêbê de rûknên Islamê hatine vegotin û ji şahdekelîmê heta destnivêj û rûknêd nivêjan û sureyên *Qur'anê* yê kurt û çend dua cih digirin. Kitêb jî 17 peran pêk dihête û wekî eqîdename û ilmihalekê -di nav kitêbên ‘ulumuddîniyye de- hatiye amadekirin. Di dawîya kitêba *Gaziya Welat-Iê* de ev berheme di nav “Mekteb Külliyyatından” hatiye tesnîfkirin û wek “kitêba dê bête çapkirin” (“Derdest-i Tab’ Olan Asarî”) dihête rêzkirin (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 25). Kitêb li ber dest e û ew jî aliyê Ayhan Tek ve digel analîza naveroka wê hatiye weşandin (bnr. Tek, 2018b).

Dersa Dîn, ji gelek aliyan ve berhemeke balkêş e ku hem jî bo fêmkirina hizra rewşenbîrên sedsala borî hem jî ji bo tehlîla wê serdemê metneke enteresan e. Ji ber ku di xebata navborî de ew metn hatiye tehlîlkirin û weşandin, em di vê nivîsê de zêde li ser wê narawestin.

ii. Kilîla (Miftaya) Xwendinê: Elifbêya Kurdî

Rehmî Hekkarî di dawîya berhema xwe *Dersa Dîn* de behsa vê kitêba xwe diket ku wî ev berheme bi niyeta fêrkirina alfabeya Kurdî nivîsiye û di nava listeya kitêban de wek “kitêbê hatî çapkirin” hatiye nasandin. Lê ev berheme heta nehe negeheştîye ber destê me (Geveerî 2017: 148-149; Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew, 1921: 17). Herwisa di rûpela dūmahîkê ya *Gaziya Welat-Iê* de jî behsa vê berheme dihête kirin ku navê wê jî bi şiklê *Mifta Xwendî* (“Mekteb Külliyyatından” Kürtçe Elifba Kitabı) derbas dibit. Lê di *Gaziya Welat-Iê* de ew kitêb wek “kitêba hêj nehatî” çapkirin dihête nasandin. (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî, 1919a: 25). Vêca yan ew berheme hatiye amadekirin lê nehatiye çapkirin, yan jî hatiye çapkirin lê negeheştîye ber destê me. Her çawa be, ji bo têgeheştina fikr û karê Rehmî Hekkarî yê di vî warî de, fikirîna wî ya li ser berhemeke wisa gelek girîng e. Lewra wekî ji danasîna wê jî diyar dibit, Rehmî Hekkarî xwestîye ji alfabeyê heta meseleyên dînî, ji tarîxê heta tecwîd û cografyayê zarokên Kurdan perwerde biket û ji bo tadrîsa wan, mufredatekê amade biket. Ew niyet bi serê xwe xaleka gelek girîng e ku heta ev yeke nehête fêmkirin, Rehmî Hekkarî jî baş nahête nasîn.

iii. *'Eqîda Îmanê/ 'Eqîda Kurdan (Kürtçe Din Dersleri) -Li ser Mezhebê Îmam Şafî'*

Ev kitêbe di *Dersa Dîn* de wek berhemeke çapkirî dihête nasandin. Ji bo sala duyan ya tadrîsatê hatiye amadekirin (Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew 1921: 17; Tek 2018b, 856). Halê wê yê çapkirî negeheştîye ber destê me, lê ew di arşîva me de wek destxet heye ku ew di nav kulliyata Rehmî Hekkarî de ji bo çapê hatiye amadekirin. Di dawîya kitêba *Gaziya Welat-Iê* de di bin îbareya "Sahib-i Eserin Neşrolunan Asarî" de wek kitêba çapkirî dihête zikrîkirin (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 25). Ji ber wê, ihtimaleke mezin ev kitêb hatiye çapkirin lê îro li ber destê me nîne. Kitêb wekî *'Eqîda Ehmedê Xanî bi wezna 'erûzê bi helbestkî* hatiye nivîsîn. Di serê kitêbê de îbareya "Kürtçe Manzum Îlmihâl" heye. Navê nivîskar jî bi vî şiklî hatiye nivîsîn: "Nazimê wê: Ji mala Hekkariyan neviyê Hacî Teyyar Begî Ebdurrehîm Rehmî." Tarîxa çapê jî 1334 e. Lê di dawîya kitêbê de tarîxa xilaskirina kitêbê 1331 e. Herwisa di dawiyê de beyteke zêde ya tarîxê heye ku tê de bi hisaba ebcedê tarîx (1331) hatiye vegotin: "Ewel û axir ku yek e sanî yû salis ku sê / Qenc tefekkur ke bizane bûye tarîxa ewê (Evdurrehîm Hekkarî, 1918 [1334],16)."

Derheqê vê berhemê de tişta balkêş ew e ku di destxetê de navê kitêbê li şûna *'Eqîda Îmanê* wekî *'Eqîda Kurdan* hatiye. Çêdibe du kitêbên cuda bin û yan heman kitêb be ku pêşiyê wekî di destxetê de hatî bi şiklê "Eqîda Kurdan" be ku wextê ku hatiye çapkirin bibe "Eqîda Îmanê." Ji ber ku halê çapkirî li ber destê me nîne, ev mesele jî wisa nediyar maye. Lê ji destxeta wê dihête dîtin ku di kitêbê de dîne Islamê hatiye vegotin ku li gor şertên îmanê mirovekî Bisirman lazim e îmanê bi çî tiştan biînît. Di dawîya kitêbê de piştî xilaskirina şertên îmanê qîsmek jî li ser Muhemmed Pêxember hatiye vegotin û wisa berhemê temam bûye.

Di destxetê de nehatiye gotin ku ka ew berhem ji bo çî hatiye nivîsîn. Lê di dawîya *Dersa Dîn* û *Gaziya Welat-Iê* de dihête gotin ku ev ji bo zarokan û perwerdeya wan (ji bo sinifa ewil) hatiye nivîsîn. (Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew 1921: 17; Tek 2018b: 856).

I. II. Tabloyên Lêkeran

i- Tabloyên Kêşana Lêkerên Kurdî ji bo Zarok û Ciwanên Kurd:

Evdurrehîm Rehmî di kovara/rojnameya *Jînê* de ji aliyê weşandina metnên edebiyata Kurdî, xwedanê çalaktirîn imzayê ye. Lewra di vê kovar û rojnameyê de wî gelek nivîs û helbestên balkêş û metna ewil ya piyesa Kurdî "Memê Alan" belav kiriye. Herwisa wî sê tabloyên lêkerên Kurdî çêkirine û wî ew tablo digel rojnameya *Jînê* belav kirine ku ew ji bo zarok û ciwanên Kurdan diyarî ne:

Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bi sê hejmarên rojnameya *Jînê* ve (navbera tarîxên 1 tîrmeh – 15 tebax – 20 çiriya paşî 1920) sê tabloyan wek diyarî belav diket ku di her tabloyekê de hem

muxetabên diyariyê cuda ne hem jî mijarên ku di wan de hatine behskirin cuda ne. Tabloya yekem (1ê tîrmeha 1920ê) bi ser navê “Diyariyek ji bo zaroyê Kurdan”-“Kürd gençlerine bir hediye” hatiye çêkirin û li aliyê çêpê-jorî “hejmar: 1” û li aliyê dî (rast-jorî) jî “cedwel: 1” hatiye nivîsîn. Di binê van îbareyan êdî tabloya lêkerên kurdî digel wergera wan ya bi tirkîya osmanî hatiye dan. (Geverî 2017: 150)

Herwekî ku Ayhan Geverî jî di nivîsa xwe de îşaret kirî, baş diyar dibit ku di her du cedwelên dî de jî muxetabên Rehmî Hekkarî ciwanên Kurd in: “Di serê tabloyê de, îbareyên “Diyariya duyê ji bo xortê Kurdan”-“Kürd gençlerine ikinci hediye” hene” (152) û “Li ser tabloy[a sêyê] dîsa bi du zimanan ev îbare nivîsîne: “Diyariya sêyê ji bo biçûkê Kurdan” - “Kürd gençlerine üçüncü hediye” (153).

Rehmî Hekkarî herçiqas di van tabloyan de îbareyên “ji bo zarê Kurdan”, “ji bo xortê Kurdan” û “ji bo biçûkê Kurdan” gotibe jî li beramberê van hemî îfadeyan gotiye “Kürd gençlerine.” Yanî di Kurdiya wan de sê muxetabên cuda yên sal-cuda hebin jî di Tirkîya wan de hemî jî bûne xort (genc). Lê her çawa be jî, aşkera ye ku Rehmî Hekkarî dixwazît biçûk û xortên Kurdan perwerde û terbiye biket da ku ew haydarê ziman û gramera xwe bibin. Ev yek piştî *Nûbihara Biçûkana* Ehmedê Xanî nimûneyeke dî ya balkêş e ku rewşenbîrek ji bo zarok û ciwanan berhemana binivîsit.⁹ Bi vî şiklî hem dewamdariya îdeolojîk hem jî dewamdariya îdol û îdeologbûnê bi awayê “babîni” bi vê rêze-berhemana ve mumkin dibû. Ji ber wê, ji bo kesên ku dixwazin meseleyên sosyo-polîtîk bi awayekî bingehîn biêxine bin-hêşê civakekê rêya herî baş nivîsîna ji bo zarok û ciwanan e. Lewra potansiyela herî musaid ew sinif û ew temen e.

I. III. Helbestên ji bo Jin û Zarokan

i. Helbesta “Ji bo Civata Dayikan”

Rehmî Hekkarî, gelek caran ji nivîskarekî rêzê wêdatir wek rojnamevanekî nivîskarî kiriye. Ji ber ku wî li ser mijarên aktuel dinivîsî, gelek nivîs û berhemên wî yên wisa îro li ber destê me hene. Divêt em ji wan çend mînakana bidin: piştî bihîstina xeberê kuştina Hemzeyê Miksî (ku xeberekî ne rast bû) Rehmî Hekkarî ji bo wî bi navê “Şehîdê Kurdistanê: Hemze” helbestek (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî, 1920 [1336], 2) nivîsiye. Dîsa piştî ku Şerîf Paşa ji bo peymanbestinê çûye Parîsê li ser wî helbesta bi navê “Ji bo Şerîf Paşa” nivîsiye û ew di *Jînê* de belav kiriye (Bozarşan 1988: 907). Herwisa piştî ku li Stenbolê komeleyeke jinan dihête damezirandin, wî helbestek bi navê “Ji bo Civata Dayikan” nivîsiye û xwastiye wê ligel wergera wê ya Tirkî di rojnameya *Serbestiyê* de (di nusxeya 28ê Nîsana 1919ê) çap biket. Lê Idareya Sansûra wê demê ev helbeste sansûr kiriye û tenê wergera wê ya bi Tirkî weşandiye. Rehmî

⁹ Ehmedê Xanî jî bi awayekî wek şair, “bab”ekî xurt e. Ji bo zêdetir agahiyên derheq “bab”bûna Xanî û di edebiyata Kurdî de wek “babek edebî” tesîra wî li vê xebatê binêrin: (Tek 2018a).

jî li ser wê yekê nivîseke Tirkî bi navê “Kürdçe Yazılar”ê di nusxa roja paştir de belav diket ku tê de behsa vê sansûrê kiriye (Abdurrahim Rahmî, 1919: 1). Lê helbesta xwe ya Kurdî jî di *Jînê* de belav diket (Ebdurrehîm Rehmî 1919b: 16; Bozarslan 1988: 942). Bi vî awayî dihête dîtin ku Rehmî Hekkarî ne tenê di mijara zarok û ciwanan de, di meseleyên wekî civatên jinan de jî hişyar bû. Ji ber wê jî mirov rasterast nikare wî di qalibekî de bi cih biket. Lewra ew kesayetiyêke pir-layî bû û li ser meselan dişiya lez û bez helbest û nivîsan binivîsit.

Ji Bo Civata Dayikan

Pirsî ji esrê dewran: “Fenn û tereqqiya te
Dewletserê çi ye? Got:
“dewletserê jinan e”

Lewra qe nahewin ew, şev û roj ewan xebat e
Ca zariyekî mezin kin; jîna welat bi wan e

Insan bi eslê fitret ne qenc e, ne xirab e
Qenc û xirabiya me bi rakirina diyan e

Emrê Resûl e: “Cennet bin piyê ummehatan”
Lewra deha, zekawet bi terbiya ewan e

‘Îlm, fezîleta wan hindî biket tereqqî,
Techîz bibin mukemmel bi exlaqê maderane

Em dê bilind bin hind, heta bigihîne ewcan
Wextê felahbûnê, zeman jî ev zeman e

Gotin, vekirine dayan civatekê bilindî
Ya Reb tu pêkve bîne, tewfîqekê de wane

Rehmî nedît ku laiq teqdim biket hediyye
Hediyye ger qebûl bit wî daye cism û cane (Ebdurrehîm Rehmî
1919b: 16).

Di vê helbesta Rehmî Hekkarî de jî xuya diket ku ew ji aliyekî ve kesekî dîndar e ku referansên wî exleb dîni ne. Ji aliyê di ve jî wek rewşenbîrekî modern ku di serdema xwe de pêşketina civakê bi serkeftina jinan têkildar diket. Bi vî awayî piştgiriya wî ji bo vekirina komeleya jinan ya wê serdemê, fikra Rehmî Hekkarî jî nîşan didet.

ii. Helbesta “Nalîna Sêwîkî”

Helbesta Rehmî Hekkarî ya bi navê “Nalîna Sêwîkî”, helbesta dawî ya *Gaziya Welat-Iê* ye. Helbest ji bilî *Gaziya Welat-Iê* de (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 24), di *Jînê* de jî hatiye weşandin (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919c: 11-12; Bozarslan 1986: 12). Di helbestê de gazindeyên zarokekî hene ku babê wî ji aliyê “kafirên” ve hatiye kuştin û mala wî hatiye xirabkirin. Wekî ku ji helbestê tê famkirin, ew kesê ku di helbestê de diaxivît kesekî sêwî ye û xaniyê wî hatiye sotin û ew li ser dewlemendî û xanedaniya xwe ya berê nemaye. Herwisa ew bûye mihacir û muhtacê kereke nanî. Ji helbestê diyar dibit ku leheng û vebêjerê helbestê, ji ber ku dayik û babê wî hatiye kuştin, bûye sêwî. Lê em nizanin ka ew temenbiçûk yanî zarokekî sava ye yan ne. Feqet ji ber ku vebêjer refereya rojên ewil yê şadman û xanedanbûna malbata xwe diket, mirov dişê wê yekê bo nîşana temendirêjbûna wî werbigirit. Lê dîsa jî ji ber ku mirov dikarî di navbera “bêçarebûn” û “zarokbûnê” de têkiliyekê saz biket. Herwisa ev helbesta Rehmî Hekkarî jî di nav helbestên derbarê zarok û jinan de nimûneyeke balkêş e:

Nalîna Sêwîkî

Ez mame sêwî bê da û bab im
Xaniyê min sotin, ez malxirab im

Babê min kuştin bêdîn kufaran
Muhtac im îro destê neyaran

Gurgê du-pê hatin, ketne keriyên
Muhacir im ez wê ketime deriyên

Nanek dixwazim ji bo vejînê
Rehmê me nakin ji xeyrê kînê

Insaf bikin ey ewladê Adem!
Ez jî mirof im, qet xwe bi we nadem

Wextê zeman da ez xanedan bûm
Cihê xwe da ez sahibqiran bûm

Rojê du sed mêr min bûne mêhvan
Daîm tijî bûn min dergêh dîwan
Ji goşt-birincan sifre dirêxist
Memnûn, mureffeh min rê-diêxist

Îro min ‘ar e ez behs ji wê bikim...

Dinya we borand, îroke çi bikim..? (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 24)

Ji ber ku ev helbeste ji aliyekê ve dramaya zarokeke sêwî be jî ji aliyê din ve jî nîşaneyê derbirîna şairî ye ku mirov dişê portreyê wî zarokî wek temsîla nîşaya Rehmî Hekkarî (rewşenbîr û aristokratên Kurd) jî bibînê û wisa şîrove biket. Lewra di serdema wan de halê Kurdan rasterast wek yê wî zarokê sêwî nebît jî, nêrîn/romantîzmeke wisa li hember tarîxê/rojên berê heye. Ji ber vê yekê jî, dibit ku ev helbestên Rehmî Hekkarî wek derbirîna hişmendiya serdemekê jî bêne xwendin. Lewra ji bo analîzên bi vî şiklî, helbestên Rehmî Hekkarî nimûyên balkêş in.

iii. Helbesta “Ji bo Nesla Têt”

Yek ji balkêştirîn helbestên Rehmî Hekkarî jî helbesta bi navê “Ji bo Nesla Têt” e. Lewra ev helbeste hem nîşandera aliyê Rehmî Hekkarî yê îdeolojîk e hem jî yek ji wan helbestan e ku ji bilî zarokên xwe bo ferdekî di yê malbata xwe nivîsiye. Helbest li ser dariştina fikrên neteweyî û sosyopolîtîka Kurdan hatiye nivîsîn. Lê ya em dixwazin balê bikêşîne ser, ew yek e ku wî ev helbest ji bo zarokê bi navê “Se‘do” nivîsiye. Helbet di vir de îfadeya “ji bo” hinekê şêlû ye. Lewra şairî xwestiye rasterast vê helbestê ji bo derbirîna Se‘do binivîsît, yan Se‘do tenê lehengekî îdeal e ji bo fikra şairî? Lê her çawa bit û rasterast wek metneke edebiyata zarokan xuya neket jî, gava mirov vê helbestê digel berhemên Rehmî Hekkarî yê din difikirî, cihê helbestê jî diyar dibit. Lewra Rehmî Hekkarî, xitaba zarokan (çi zarokên wî bin, çi zarokên eqrebayên wî bin û çi jî zarokên din bin) ji bo avakirina nîşeke nû pêwîst dibin û loma divêt em vê helbestê jî wisa digel îdealîzekirina şairî bifikirin.

Rehmî Hekkarî helbesta “Ji bo Nesla Têt” hem di *Gaziya Welat-Iê* de (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 14-15) hem jî di *Jînê* de (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919d, 15-16; Bozarslan 1985: 408-10) belav diket û di her du cihan de jî ji bo “Se‘do” di jêrenotan de agahiyê didet ku ew xwarzayê wî ye.¹⁰ Balkêş e ku di berhemên wî yê Tirkî de muxetab zarokên wî bi xwe ne. Bi ya me du sebebê wê hene. Yek, wextê ku wî bi Kurdî dinivîsît ew bi xwe jî xort bû û zêdetir li ser meseleya Kurdîniyê ve mijûl bû. Ya duyê jî, wextê zarokên Rehmî Hekkarî mezin bibûn wî êdî pirtir bi Tirkî dinivîsît û nedikarî berhemên bi Kurdî bidete çapê. Ji ber hindê piştî salên ku êdî Cumhuriyet ava bibû wî jî berê xwe daye Tirkînivîsînê. Ji ber wê jî em di berhemên wî yê Kurdî de rasterast zarokên wî nabînin. Lê ji nav helbestên wî yê Kurdî de em ji malbata wî, zarokê sava yê bi navê Se‘do dibînin.

Ji serê helbestê em têdigehin ku Se‘doyê ku şair jê behs diket zarokê biçûk e. Lewra ew “şîrmij”, “biçûk” û “natuwan” e. Yanî zarokê sava û bersîr e:

¹⁰ Rehmî Hekkarî ji bo “Se‘do” du îbareyên cuda bi kar tîne. Çunku di *Gaziya Welat-Iê* de dibêjît “Se‘do xwarzayê me” (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 14) lê di *Jînê* de jî dibêjît “Se‘do, xwarzayê min e” (Bozarslan 1985: 408).

Se‘do!

Gerçi tu biçûk î, natuwan î
Lakîn sibehî tu qehreman î

Îroke tu şîrmij î, biçûk î
Paş panzdeyî canfeda peyik î

Ez dê bimirim, biçim ji dinya
Lazim wetenî bikî tu îhya (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a:
14).

Di edebiyata Kurdî de ji *Nûbihara Biçûkan* hêreve berhemên ji bo zarokan hatine nivîsîn dihêne dîtin. Lê nimûneyên pêşîn yê helbestên ku ji bo zarokên mu‘eyyen û ji xwîna şairê helbestê hatine nivîsîn, di helbesta Rehmî Hekkarî de derdikevine pêş. Ev yek ji bo têkiliya şair û îdeala wî ya digel ferdekî aşkera yê ku muxetab û lehengê helbestê gelek girîng e. Lewra di edebiyata Kurdî de zêdetir ji bo zarokên ne-me‘lûm berhem hatîne nivîsîn. Lê di yê Rehmî Hekkarî de li beramberê vê ferhenga mewcûd, ferhengeke nû hatiye danan ku wî ji bo zarokên li derdora xwe nivîsîne. “Ji bo Nesla Têt” ji wan helbestan e ku Se‘do hem lehengê helbestê ye hem jî rasterast qehremanê şairî bi xwe ye. Kêmasî û xeyalên şairî Se‘do temam diket. Lewra ew temamkerê xeyalên şairî û paşeroja wî ye. Ji ber wê herçend biçûk bit jî “sibehî” qehreman e. Bi vî şiklî diyar dibit ku Rehmî Hekkarî hem xeyalên xwe û îdeala (herwisa îdeolojiya) xwe dariştiye van helbestan, hem jî ew zarokên ne-kamil dê kêmasiyên şairî û nifşa wî temam bikin û wan jî bikemilînin. Lewra ew zarok “sibeh”a şairî ne. Ji ber wê gava şair dibêjît “ez dê bimirim, biçim ji dinya” yê wekî Se‘do dê “wetenî bik[in] îhya.” Herwisa şair, di vê helbestê de, mîrasa xwe ya şexsî û ya sosyopolîtîk li ser îdealîzekirina “zarok”ekî li Se‘do bar diket. Lewra ji aliyekî ve guhdarê şairî ye ku ew dengê xwe (“derd û eleman”) digehînte wî. Ji aliyê dî ve jî ew zarokê berşîr hêviya şairî ye û pêşeroja milletê wî ye: “Hêviya min tu yî ku ez dibêjim / Derd û eleman hemî dirêjim” (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî 1919a: 14).

Herwekî ku ji navê wê jî dîhar e, ev helbest ji bo pêşerojê yanî “ji bo nesla têt” hatiye nivîsîn. Ji ber wê çendê, gava şairî di serê helbestê de wek muxetab xitabê Se‘do kiribe jî muxetabê eslî nesla têt, yanî zarok û ciwan in. Jixwe şair wê yekê di helbestê de aşkera nîşan didet. Çunku di serê helbestê de gazî û gazinde ji bo Se‘do bin jî, piştî çend rêzan êdî şair wî jibîr diket û rasterast êşên xwe yê şexsî û civakî derdibirît û rewşa Kurdan ya sosyopolîtîk bi nêrîneke rexneyî vedibêjît. Lê gava mirov helbestê bi dawî dînît êdî mirov rasterast Se‘do jibîr diket û tenê êşên Kurdan û taybetiyên wan yê xirab di bîra mirov de dimînin:

Em milletekî cesûr û şuc‘an

Sahibşefqet muhibbê insan

‘Eslî û necîb, hem zekî ne
Lakin dinê, me heq çunîne

Lewra: me ‘ulûm, fen, sin‘et
Hêlane di nav kûra cehalet

Fikra me ‘ilm ku serf û neh w in
Bil wane funûn sefil, meh w in

Xêzan, feqîr, bêticaret
Gûya ku feqîrî bo me rif‘et

Bêdewletî fexrek e ji bo me
Hê ya me be musrifî nedome

Kîskê me vekirî ye bo zeya‘at
Bo menfe‘eta ‘umûm heyhat!!

Girtî ye, bi sed benan şidandî
Bêhimmetî ye ku em zebandî

Sed zêr bi sifrekê ziyafet
Israf dikin ji bo sefahet

Sed pare ji medresê, qebahet!!
Xasma ji bo mekteba se‘adet!!

Destê me vekirî ye, pir sexî ne
Bo menfe‘eta ‘umûmî nîne

Tunê ji bo navekî mucerred
Bo menfe‘eta xesîs û hem bed (Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî
1919a: 14-15).

Bi vî awayî Rehmî Hekkarî, derbirîna xwe bi şertê ku bo zarokeke dihar ku ew guhdariya şairî diket re vedibêjît û helbesta xwe dirêsit. Herwekî ku babek û bapîrek êdî hêviya wî ji jiyanê nemabît û hemû mîrasa xwe (hem ya şexsî hem jî wek rewşenbîrekî ya civakî) bo rêya vegotin û derbirînê bo nesla bê neql biket, şair ji bo Se‘doyê xwarzayê xwe dinyaya xwe vediguhêzît.

iv. Helbesta “Mirovînî”

Helbesta duyê ya ku Rehmî Hekkarî ji bo Se'doyê xwarzayê xwe nivîsiye helbesta bi navê "Mirovîni" ye. Ev helbeste hem di *Jînê* de belav bûye hem jî di nav *Gaziya Welat-Iê* de heye (Ebdurrehîm Rehmî 1919a: 21-22; Bozarlan 1987: 792-3). Di vê helbestê de li ser wê çîroka ku di navbera bab û kurî de ya ku li ser "mirovbûnê" ve meşhûr e hatiye rawestan. Şair wê çîroka li nav milleti dihête vegotin dîsa bo Se'do vedibêjit. Yanî herwekî di helbesta "Ji bo Nesla Têt" de jî dihête dîtin, şair xwarzayê xwe hem wekî xwedanê mîrasa xwe ya fikrî dibînît hem jî wî wekî zarokekî ku divêt ji aliyê mezinan ve bihête terbiyekirin hizir diket. Bi vî şiklî jî bo şairî motîvasyonek çêdibit ku ew ji aliyekî ve wekî rewşenbîrekî bikaribît fikrên xwe li ser Se'do bigehînte xelkî. Şair wisa zemînê vegotina meseleyê û înzaya bingehê îdeolojîk bi rêya xitaba bi Se'do ve pêk dihêtin. Ji aliyê dî ve jî wek rewşenbîr problemên civakî û rexneya xwe ya derbarê civakê de bi vî şiklî der diket. Lê roleke dî ya rewşenbîr û şairên wekî Rehmî Hekkarî heye ku ew rexneyeke rasterast nakin. Digel rexneya xwe herwisa ew di rola "bab"ê civakê de ne ku dixwazin "civaka ji rê derketî" û di nav cehaletê de xerqûyî derxine saxî û silametiye. Ji bo wê jî gelek caran civak peyama rewşenbîrî tênagehin û li şûna bikevine ser rêyeke rast, li ser nezaniya xwe ya berê dimînin. Ji bo van tesbîtan ev helbesta "Mirovîni" nimûneyeke baş e. Lewra ew çîroka navdar bi kurtî wisa ye: kurê ji aliyê babê xwe ve sexer lê dihête birin, di dawiya dawî de li hember gotina babê xwe ya "kurê min tu nabî insan" diçît, dixwûnît û dibîte walî. Lê ji ber ku babê xwe bi emr û fermanan diînite miqam û piyê xwe, babê wî gotina xwe dubare diket: "belkî tu bûyî walî, lê nebûyî mirov."

Vêca Rehmî Hekkarî bi vî awayî wê çîroka di navbera "kur-bab" de bi kar diînit ku ew yek, yanî bikaranîna vê çîrokê, yekser têkilî bi hizirîneke Freudyan û psîkanalît ve heye. Lewra kur hemî gava di bin tesîr û hêza babê xwe de ye û hemî gava ew reqabeta xesandina aliyê zeîf di vê têkiliyê de derdixîte der. Ji ber wê yekê Rehmî Hekkarî gava wekî babekî îdeolojîk tevdişerît û vê helbestê dinivîsît, ew bi refleksa babîniyê hereket diket. Loma li ser ne-kamilbûna kurê xwe yê ku bi temsîla walîtiyê ve bê-hêz diket, mirov dikarît di çarçoveya kompleksa Oedipusê de binirxînît. Lewra ew kurê kê-m-îz'an herçiqas di meqamek ku temsîla hêzê diket de bît jî ew kê-m-iqtidar e. Lewra ew nikarît ji bin siya babê xwe derkevît. Herçiqas ew ji bin wê siyê derbikevît û bikevîte bin siya babeke dî yê temsîlî (dewlet) yê hêzdar jî, ew neşet xwe ji bandora babê biyolojîk xilas biket. Ji ber wê ev diyalog di navbera kur û bab de derbas dibît:

- Babo...! Be te got "tu nabî insan"

Walî me, di milki da hukumran

- Haşa... Min negot "tu nabî walî"

Belku ji miroviyê tu xalî" (Ebdurrehîm Rehmî, 1919a: 22).

Ji aliyê kurî ve “insanbûn” û “temambûn” girêdayê hêza iqtidar û desthilatdariya milk û hukumraniyê ye. Lew dibêjît: “Walî me, di milki da hukumran [im].” Yanî kur bi vî şiklî li hember hesta xesandin û givaştina bi destê babê biyolojîk, dixwazît hebûna xwe isbat biket û serxwebûna xwe ya şexsî pêk biîne. Bi taybetî jî piştî xwe bi hêza dewletê ve xurt diket û li hember babê xwe yê biyolojîk hêza “dewlet-baba” bi kar tîne. Lê ji ber ku ew neşê ji girêya babê xwe yê biyolojîk derkeve, ew hêzdarbûn û walîtî jî kar naket ku babê wî jê re hê di serê çirokê de dibêjît ku “kurê min tu nabî insan.” Helbet ev gotine ya wî babî ye yê ku di çirokê de leheng e. Lê beriya wê jî gava şair dest bi çirokê diket wisa dibêjît: “go heb[û] kurek kê-m-îz’an.” Yanî di vê neqle-gotînê de Rehmî Hekkarî jî di rola babê vebêjer de ye ku li gor wî, ew kur “kê-m-îz’an” e ku wî xwe temam nekiriye. Bi vî şiklî bi vê analîzê mirov dişêt vê “kê-m”asiyê bi analîza Nurdan Gürbîlekê ve girêbidet. Çawa Gürbîlek behsa “babên kê-m-çêbûyî” (azgelişmiş babalar) diket, mirov dişêt lêre vê te’bîrê ji wê neql biket û termînolojiyê wek “kurên kêmas” (“azgelişmiş oğullar”) danêjît. Lewra di tesbîta Gürbîlekê de qesta ji “kê-m”bûnê çî bît di helbesta Rehmî Hekkarî de jî ew “kê-m”bûn heman tişt e. Çînkû bi walîbûnê kur nagehîte “temambûnê” û ew digel hinde hêza hukumî jî neşê bibîte xwedan hukm û iqtidar. Ne ku “nabî”, “neşê bibî.” Wêca ji ber wê çendê, ev diyaloga li jorî pêk dihêt û li hember isbatkirina hêza xwe (walîbûn-emrdayîna bi qumandan) û xesandina bi destê babê xwe (havêtina zindanê), babê wî dibêjîte wî: “Mî-negot tu nabî walî / Belku jî mirovahiyê xalî.” Ji mirovahiyê xalî, yanî kesê kê-m-mirov û kê-m-kur:¹¹

Mirovîni

Se‘do, go hebî kurek kê-m-îz’an
Gotî “kurê min, tu nabî insan”

Ew gotine lê qewî giran hat
Rabû enirî, înad bi ‘eyan hat

Derket ji welatî, wî sefer kir
Lewra; xeberî di wî eser kir

‘Ehd kir, biçitîn bibit qumandan
Yan walîyekî biheşmet û şan

Ew çû xebitî, di mekteban xwend
Ca paş ve nemînit ‘ehd û peywend

Lewra nedixwezt bibîte ‘alim
Nîyet hebû ew bibîte zalim

Çend mektebekan wegirt wesîqe

¹¹ Ji bo zêdetir agahdariya derheqê vê mijarê de bnr. (Gürbîlek 2016: 52-65).

Tali' kire walî bêselfîqe

Berkiriye ji zêr cilêd muzeyyen
Ew hakim û walî ye mucyeyen

Gava zivirî, geheşte bajêr
Ew cahil û ehmeqê ku bêxêr

Emrek ji xwe daye bo qumandan
Babê xwe heman havête zindan

Roja dîtir aniye huzûrê
Ew tehle-xeber înande bîrê:

- Babo..! Be te got "tu nabî însan"
Walî me, di milki da hukumran

- Haşa... Min negot "tu nabî walî"
Belku ji miroviyê tu xalî" (Ebdurrehîm Rehmî, 1919a: 21-22).

Bî vî şiklî Rehmî Hekkarî çîrokeke ku di nav gel de dihate gotin ji bo veguhastina mesaja xwe û qahîmkirina rola xwe bi kar îname. Çalakkûna îdeologbûna Rehmî Hekkarî girîng e ku wê yekê motîvasyonê wî xurt kiriye. Lê ji aliyê dî ve jî ev yeke nişan didet ku şairî gotinê di nav xelkê de dihatine gotin, baş bikar îname û guhê wî rasterast li gelê wî bûye.

Encam

Ji metnên Kurdî yê ji bo zarokan hatine nivîsîn xuya diket ku pedagojî û edebiyat du mijarên têkildar in. Lewra şair û rewşenbîrên Kurd xwestine ji aliyê ve zarokên Kurd perwerde bikin. Lê ji aliyê dî ve jî ew berhemên xwe di nav çarçoveyê edebî û kanonîk de binivîsin. Ji ber van sedeman jî rola perwerdeyê bi wan metnên edebî ve pêk dihat û li ser wê bîngeha pedagojîk û kanonîk edebiyateke (derbareyê) zarokan ava bûye.

Di Kurdî de metnên nav têgeha "edebiyata zarokan" hatine nivîsîn, zêdetir ya ferhengên pîrziyanî yan jî berhemên li ser alfabeyê ne. Yanî berhemên didaktîk yê li ser leksîkolojiyê û gramêrê pêşdetir in. Ji ber wê jî gava xîmê edebiyata zarokan dihête avêtin, digel wê, xîmê edebiyata mezinan jî saxlemtir dibit. Çunku zimanê Kurdî muhtacê saziyên perwerdeyê bû û erka wan saziyan jî li ser milên şair û rewşenbîrên nivîsênde bû. Yan jî kesên wisa di nav nivîsê de bûn xwe berpirsyar hîs dikirin ku di wî warî de berhemên binivîsin. Yek ji wan rewşenbîran jî Emdirrehîm Rehmî Hekkarî bû ku wî jî li hember zarok û ciwanan xwe bargiran hîs kiriye ku li ser wê berhem nivîsiye. Helbet gava di wî warî de jî dinivîsît du tişt hevûdu temam dikin. Yek ew mesûliyeta me behs jê kirî, ya din jî motîvasyonê nivîskarî ya îdeolojîk. Lewra kesên wekî Rehmî Hekkarî

herçiqaş bixwazin zarok û ciwanan perwerde bikin jî armanceke dî jî ew yek e ku li ser wê perwerdeyê nîfşeke nû bigehînin.

Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî di van berhemên xwe yên ku me behs jê kirî de profileke wisa nîşan didet ku berhemên wî li aliyekê, bi nêrîn û uslûba xwe ve ew bi xwe jî şayanê lêkolîneke berfireh e. Herwisa xebatên wî jî musaid in ku li ser wan bi nêrînên nû ve xebat bêne kirin. Lewra ew di xebatên xwe de tenê naverokê neql nake. Digel vê, wek rewşenbîrekî wek nivîskarekî Kurdî dîndar nimûneyên ramana serdema xwe jî nîşanê me didet ku em dişên li ser wan nêrînên wî serdema wî û edebiyata Kurdî şîrove bikin. Ji ber wê jî ew berhemên wî yên ku ji bo zarokan ji bo gencan û ji bo jinan hatine nivîsîn girîngiya xwe diparêzin. Lewra xebatên teorîk li ser wan berheman nehatîne kirin.

Wekî rewşenbîrên li vê cografyayê, Evdîrrehîm Rehmî jî xwe ne tenê wek nivîskar û rewşenbîr ditiye. Rasterast wî ev yêke negotibît jî ji nivîsên wî kifş dibît ku wî jî civak wek cimaeteke pêdivî bi terbiye û telîmê ditiye. Di vê derê rola wî jî derdikevît der ku ew, xwe jî li hember civateke wisa wek otorîte/babekî dibînît ku divêt ew civat xeberê wî biket û di bin çavdêriya wî de pêş bikeve.

Rehmî Hekkarî di vê çarçoveyê de gava rêyekê nîşan civakê didet, du hêmanên bingehîn li hember civaka xwe mecbûr diket. Yek Kurdewarî ye ya dî jî Islambûn yanî dîndarî ye. Bi vî şiklî wî wek şairekî dîndar û Kurdperwer berhemên edebî nivîsîne ku li gor serdema wî ew xebat gelek orjînal xuya dikin ku divê li ser wan xebatên berfireh bêne kirin.

Çavkanî

- Abdurrahim Pertev [Rehmî Hekkarî]. (1340/1924). *Esir Çocuklara Ahlâk Aşısı*. (İkinci Baskı). İstanbul: Necm-i İstikbâl Matbaası. [Abdurrahim Pertev, 1919].
- Abdurrahim Pertev [Rehmî Hekkarî]. (1919). *Garib Çocuklara Ahlâk Aşısı*. Bakü.
- Abdurrahim Rahmi. (1919). "Kürdçe Yazılar." *Serbestî*. jimar: 480: r. 1. (29 Nisan).
- Bozarslan, M. E. (1968). *Alfabe*. İstanbul: Sim Matbaacılık. [çapa duyem: (1996). Uppsala: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1979). *Meyro*. İstanbul: Çıra Yayınları.
- Bozarslan, M. E. (1981a). *Meyro*. Boras: Invandrarförlaget.
- Bozarslan, M. E. (1981b). *Mîr Zoro*. [çapa duyem: (1999). Amed: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1982a). *Gurê Bilûrvan*. [çapa duyem: (2000). Stenbol: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1982b). *Kêz Xatûn*. [çapa duyem: (2002). Stenbol: Weşanên Deng].

- Bozarslan, M. E. (1984). *Serketîna Mîrişkan*. [çapa duyem: (2005). Stenbol: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1985). *Pepûk*. [çapa duyem: (2006). Amed: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1987). *Masyên Beji*. [çapa duyem: (2007). Amed: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1988). *Jî Dinan Dintur*. [çapa duyem: (2009). Amed: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1989). *Ilmê Tûrik*. Uppsala: Weşanên Deng. [çapa duyem: (2011). Amed: Weşanên Deng].
- Bozarslan, M. E. (1990). *Bûka Gulsin*. Uppsala: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (1991). *Mela Kuli*. Uppsala: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (1997). *Guli Xatun*. Uppsala: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (1998). *Kurê Mirê Masiyan*. Uppsala: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (1999a). *Keçika Darin*. Stenbol: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (1999b). *Keçika Qırşfiroş*. Stenbol: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (2000). *Ditunhezar*. Stenbol: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (2002). *Gulê û Sino*. Stenbol: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (2007). *Masyên Beji*. Amed: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (2009). *Jî Dinan Dintur*. Amed: Weşanên Deng.
- Bozarslan, M. E. (Amd.). (1985). *Jîn*. (c.: 2). Uppsala: Weşanxaneyê Deng.
- Bozarslan, M. E. (Amd.). (1986). *Jîn*. (c.: 3). Uppsala: Weşanxaneyê Deng.
- Bozarslan, M. E. (Amd.). (1987). *Jîn*. (c.: 4). Uppsala: Weşanxaneyê Deng.
- Bozarslan, M. E. (Amd.). (1988). *Jîn*. (c.: 5). Uppsala: Weşanxaneyê Deng.
- E[bdurrehîm] Rehmî. (1919e [5 Nîsan 1335]). “Mirovîni.” *Jîn*. hej: 18: 13-14. [di nav de: Bozarslan 1987: 792-3].
- Ebdurrehîm [Rehmî Hekkarî]. (b.t.). *Mifta [Kilîla] Xwendinê*. [di nav de: Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew 1921: 17]
- Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî. (1919a). *Gaziya Welat-I*. Îstanbul: Necm-i İstikbâl Matbaası
- Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî. (1920 [21 Hezîran 1336]). “Şehîdê Kurdistanê: Hemze.” *Jîn* [rojname]. 36: 2.
- Ebdurrehîm Rehmî Ibn-i Pertew. (1921). *Kürtçe Din Dersleri: Dersa Dîn*. Îstanbul: Necm-i İstikbâl Matbaası.
- Ebdurrehîm Rehmî. (1919b [2 Temmuz 1335]). “Ji Bo Civata Dayîkan”. *Jîn*. hej: 22: 16. [di nav de: Bozarslan 1988: 942].
- Ebdurrehîm Rehmî. (1919c [10 Şewat 1335]). “Nalîna Sêwîkî.” *Jîn*. hej: 11: 11-12. [di nav de: Bozarslan 1986: 12].
- Ebdurrehîm Rehmî. (1919d [3 Kanûna Paşî 1335]). “Ji Bo Nesla Têt.” *Jîn*. hej: 8: 15-16. [di nav de: Bozarslan 1985: 408-10].
- Ehmed, Rêwaz. (2005). *Seretayek Der Barey Serhildanî Edebî Mindalanî Kurd*. Hewlêr: Çapxaneyê Wezaretê Perwerdeyê. [ji neqla Tosun 2018].
- Ekinçi, M. (2016). “Lêkolîneke Li Ser Motîfên Lawiran Ên Ku Di Berhema M. Emîn Bozarslan Ya Rêzeçîrokên Lawiran A Bi Navê “Meselokên Lawiran”

- De Cih Digirin.” Muş: Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtuya Zanistên Civakî. (Teza Masterê ya Çapnebûyî).
- Evdurrehîm Rehmî. (1918 [1334]). *‘Eqîda Kurdan [Îmanê]*. İstanbul: Necm-i İstikbâl Matbaası. [Berhem wek destxet e di arşîva me de].
- Geverî, A. (2017). “Sê Tabloyên Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî Yên Derheq Kêşana Lêkerên Kurdî.” *Derwaze*. hj.: 1. r. 148-155.
- Gürbilek, N. (2016). *Kötü Çocuk Türk*. İstanbul: Metis Yayınları.
- Işık, Ü. (2017). “Xebatek Li Ser Ferhengên Kurdî.” Muş: Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtuya Zanistên Civakî. (Teza Masterê ya Çapnebûyî).
- Subaşı, K. (2018). *Girr û Gallî Mindallanî Kurd -Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî-*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Tâbibzâde Abdurrahim Rahmi ibn-i Pertev. (1334/1915). *Esir Bir Çocuğun Başına Gelenler*. Trabzon: Serasi Matbaası.
- Tek, A. (2018a). *Hâmîsiz Şâir, Babasız Metin: Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir Araştırma*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Tek, A. (2018b). “Ebdurrehîm Rehmî Hekkarî û Tehlîlek Li Ser Berhema Wî Ya Bi Navê Dersa Dîn.” *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. jimar: 6 (6): r. 839-858.
- Tosun, T. (2018). “Edebiyata Zarokan A Kurdî Li Bakur.” *Humanities Journal of University of Zakho*. vol. (6)1. jimar: 1. r. 147-154.
- Zapsu, Abdurrahim. (1918). *Esir Bir Çocuğun Başına Gelenler*. İstanbul: Jîn Neşriyat.
- Zapsu, Abdurrahim. (1956a). *İslâm Yavrusunun Kitabı*. İstanbul: M. Sıralar Matbaası.
- Zapsu, Abdurrahim. (1956b). *Hâle'nin Din Soruları*. İstanbul: Sıralar Matbaası.
- Zapsu, Abdurrahim. (1956c). *Metin'in Din Soruları*. İstanbul: Sıralar Matbaası.
- Zapsu, Abdurrahim. (1956d). *Pertev'in Din Soruları*. İstanbul: Sıralar Matbaası.

Çavkaniyên Digital:

Kepir: www.spirez.net; www.spirez.org

Ciwan: www.spirez.net; www.spirez.org



Makale Geliş Tarihi: 26.12.2018

Makale Kabul Tarihi: 01.01.2019

TEORIYA HÎNKIRIN û BIKARANÎNA XWENDINÊ DI KURMANCÎ DE

Resul Geyik¹

KURTE

Wekî tê zanîn, li hemû dinyayê mirov hînbûneke sistematîk û metodolojîk bi saya xwendinê pêk tîne. Li gelek welatên Rojhilata Navîn mixabin asta xwendinê zehf kêr e. Ev rewş li bajarên kurdan jî heman rewş e û li gelek deveran asta xwendinê jî astên gelek welatan kêmtir e. Ji bona xwendinek ku bigihîje armançeke baş divê stratejîyên xwendinê baş bîn pêkanîn, xwendineke bi sistem hebe, û di hinek pêvajoyan de rewşa xwendekaran ast bi ast bê nîrxandin. Ji ber ku fakulteyên perwerdehîyê jî bona hînkirina Kurmancî tune ne, pêwîst e sazî bikaribin li ser metodolojîyê bisekinin û krîteran diyar bikin. Di ser re divê materyalên xwendinê li gorî armançên cûda bîn amadekirin û bîn adaptekirin.

Peyvên Sereke: Xwendin, Stratejî, Teorî, Kurmancî, Ast

ÖZET

Kürtçe'de Okuma Öğretme ve Kullanım Teorisi

Bilindiği gibi bütün dünyada öğrenciler sistematik ve metodolojik bir yöntemi okuma sayesinde elde edebilir. Maalesef, pek çok Ortadoğu ülkesinde, okuma düzeyi ve alışkanlığı düşüktür. Bu bahsi geçen durum elbette Kürtçe konuşulan illerde de benzerdir ve bu oran farklı şehirlerde de değişim göstermektedir. Çok başarılı bir okuma düzeyi elde edebilmek için, okuma stratejilerinin düzgün bir şekilde ilerlemesi gerekir, sistematik bir okuma sırası uygulanmalı ve her defa değerlendirme süreci düzenli bir şekilde kontrol edilmeli. Kürtçe eğitim fakülteleri olmadığı için, kurumların dil öğretim metodolojisini öğretecek temellerin atılması okuma açısından elzemdir. Bununla birlikte, ders malzemelerinin hazırlanması ve düzeylere göre adapte edilmesi gerekir.

Anahtar Kelimeler: Okuma, Strateji, Teori, Kürtçe-Kurmanca, Düzey

¹ Hindekar, Zaningeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Xwendekarê Doktorayê ye li Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî ya Zaningeha Dicleyê E-mail: resulteacher@gmail.com, ORCID NO: <https://orcid.org/0000-0003-3516-098X>

ABSTRACT

The Theory of Teaching and Use of Reading in Kurdish

As known, all over the world the Ss can obtain a systematic and methodological approach through reading. Unfortunately, in most of the Middle Eastern countries, the reading level and habit is very low. The situation mentioned is totally similar in Kurdish spoken cities as well and this ratio tends to differ in many cities. In order to obtain a very successful reading level, the reading strategies should be carried out properly, a systematic reading order should be followed and every time the evaluation period should be checked on a regular basis. As Kurdish Education faculties don not exist, it is an imperative that some organizations should be established to lay the foundation of teaching methodology and criteria in terms of reading. Moreover, authentic materials should be prepared and adapted in accordance with the level.

Key Words: Reading, Strategy, Theory, Kurmanji, Level

Destpêk

Xwendin pêvajoyeke fikirînê ya bi zanebûn û bê zanebûn e. Gava xwendekar an jî xwendevan tiştêkî dixwînin, ji bona ku bikaribin peyama ku nivîskar daye bigirin gelek stratejiyên xwendinê bikar tînin. Ji bona vê hewldanê jî ew bi gelemperî agahî û zanebûna ku di deqê de cî digire bi zanîna paşxana xwe û tecrubeyên berê re didin ber hev. Wekî baş tê zanîn, tiştê ewil ku tê hişê mirov di pêvajoya xwendinê de, bi saya xwendinê peyvên ku mirov dizane zêde dibin û fahmkirina peyvan çêtir dibe. Di xwendinê de xwendekar rastî gelek peyv û qaliban dibin, hevokên cûr bi cûr tên dîtin. Ji ber ku îfadeyên xwendin û nivîsê jî hev cihê ne, xwendin derfetek nû dide mirovan ku zimanê ku di wateyê de kûrtir e derdikeve pêşîya mirovan. Lê divê xwendin dixwazî di derzê de, dixwazî tenê bê pêkanîn, hewce ye mirov li hin tiştan miqatebe (baldar) be ku bikaribe bandora xwendine zêde bike.

1. Pêvajoya Xwendinê

Mirov dikare xwendinê wekî nêrîn û fehmkirina tiştên nivîskî îfade bike an jî pênase bike. Tiştê ku dixuye wiha ye lê xwendin hin tiştên din jî di nav xwe de dihewîne. Bo mînak, gava du kes deqekê dixwînin tiştên ku her du mirov fehm dikin bi tevahî ne wekhev in, ji ber ku mirov tiştan li gorî paşxan, zanebûn û tecrubeya xwe dinirxînin. An jî dema xwendina deqek di zimanê zikmakî û zimanekî biyanî de ku ew dixwînin dîsa jî ji lezgîniyê bigirin heya fehmkirinê gelek cudahî di navbera xwendevanan de derdikevin holê. Yanî wekî dixuye, xwendin ne tenê şiyaneke e. Ji ber taybetmendiyan xwe yê hebûna rêziman û peyvan, ragihandin û peyamên ku didin di eslê xwe de xebat an jî çalakiyêke komplîke ye. Mirov dikarin bibêjin ji ber ku armanceke xwendinê jî fehmkirina tevahiya deqê ye, xwendin di asta herî dawî de çareserkirina pirsgerêkekê ye, ew jî fehmkirina wê bi xwe ye. Ez xwendinê wekî çalakiyêke peyngirtin û çareserkirina pirsgerêkan dibînim û ev çalakî jî hêz û fleksîbîlîteya xwendekar û xwendevanan bi pratîkê zêde dike (Clay, 1991: 6).

Francoise Grellet pesend dike ku xwendin şiyaneke çalake e. Her tim di nav xwe de texmînkirin, kontrolkirin û jixwepirsînê jî dihewîne (Grellet, 1981: 8). Li ser

pirsa xwendin çima çalakiyeke aktîf e, Grellet vê bersivê dide, ji ber ku hemû çalakiyên ku mejî pêk tîne û mirov çiqas dixwîne, kûrbûna wî (kûrfehmkirin) ya li ser meseleyekê çêtir dibe, bi hêsanî dikare mijaran bi hev ve girê bide, baldarbûna wî/ê zêde dibe, fehmkirina wî/ê vedibe.

Ji bo mijara ziman hînkirinê nemaze jî ji bo îngilîzî McDonough & Christopher (2003: 89) xwendinê wekî şiyaneke herî girîng di nav şiyânên zimên de dibînin ku divê xwendekar deqên îngilîzî bixwînin ji bona beşên pisporiya wan. Û ji van xebatên xwe jî bidestxistina hinek realîteyên fehmkirina xwendinên nav polê jî girîng e.

Xwendin ji du tiştan pêk tê; nasîna peyvan û fehmkirina peyamên hevokan² (Pang û yd, 6). Di pêvajoya xwendinê de, tiştên di mejî, hest û baweriyên xwendevanan de diyar dibin: agahî/zanîn, (agahiyên çewt, kêmasiya agahiyên) stratejiyên ku deqê proses dike, kêf, tirs û dilşadiyên me yanî bandora gişta li ser fehmkirina xwendinê heye (Weaver, 2009: 8). Li gori Grellet (1981: 1) ji bona pirsê deqa xwendinê çi ye, ew vê bersivê dide; fehmkirina deqeke nivîskî tê wateya heya hêza herî dawî, derxistin û bidestxistina agahiyên pêwist in.

Mirov dikare xwendinên xwe ji listeya jêr hilbijêre (h.b., 1981: 1-2)

- Novel, çîrok, deqên wêjeyî (nivîs, rojenivîsk, bûyer, biyografi)
- Şano
- Helbest, lîmerîk, helbestên zarokan
- Name, kartpostal, telegram, nîşe
- Rojname û kovar
- Gotarên taybet, rapor, nirxandin, ceribandî, nameyên kar, kurte, hesap, broşûr (yên politîk an ên din)
- Pirtûkên destan, pirtûkên dersan, rêber
- Tarîfên xwarinan
- Reklam, broşûrên gerê, katalog
- Xaçepirs, pirsgerêk, kuralên listikan
- Talimat (ên hişyarîyê), rênîşandan, kural û zagon, poster, îşaret (îşaretên rêyan), form (formên serlêdanê, kartên balafiran), graffiti (nivîsên dîwaran), menû, listeyên bihabûnê, bilêt
- Xêzefilm, xêzikên karton, karîkatur, lehengên (wêneyan)
- Statîstîk, grafîk û cûreyên wan

² Pirtûka ji aliyê Unescoyê hatiye amadekirin. Teaching Reading. Elizabeth S. Pang, Angaluki Muaka, Elizabeth B. Bernhardt, and Michael L. Kamil, gihiştin 18.03.2016 seet 07.17 (<http://www.ibe.unesco.org/International/Publications/pubhome.htm>)

- Rêbera telefone, ferheng û qilavûzên zimanan.

Hedge (2001: 192) pênaseya xwendinê wiha berfireh dide:

“Zanêbûna zimên derfeta xebata ser zimên dide xwendevanan. Xwendevanên baş peyv, avasaziyên rezimanê û hêmanên zimannasiyê zû û rast nas dikin, deşîfre dikin û dema dikevin nav vî karî hayê wan ji pêvajoyê jî tune ye. Yanî, xwendevaneke ku axaftina wî/ê herikbar e xwediyê zanêbûna avasaziyên zimaneke baş e û gelek peyvyan bi awayekî otomatîk dinase”.

Zanêbûna peyvyan bi awayekî xwezayî dijwar e ku xwendekar dikevin nav pirsgirêkan. Zanêbûn an jî nezanebûn pirsgirêkeke derûnî ye, nêzikatiya xwendekaran dîyar dike. Loma pêşiya xebata xwendinê, dema ku mamoste li ser peyvên sereke dixebitin, asta xwendinê bilind jî be, xwendekar bi awayekî erênî ji bo dersê amade ne. Nation û Coady (1988: 104-105) ji bona ku xwendekar bikaribin li ser deqên bixebitin 5 rêze-çareseriyên pêşniyaz dikin:

- a. Dîtina peyvên nayê zanîn.
- b. Nêrîna konteksa hevokê û hêsankirina wê.
- c. Nêrîna konteksa berfirehiya peyva nayê zanîn û ev jî tê analîzkirina peyva ku hevokê de ye û hevokên pêwendîdar.
- d. Texmînkirina wateya peyvê.
- e. Kontrola texmîna peyvê.

Teoriya Şemayê ya Xwendinê

Prosesa jêr û jor: Agahî ji tiştên giştî ber bi tiştên taybet ve diherin (dere).

Prosesa jor û jêr: Ev proses di asteke bilind de, ji texmînên gelemperî pêk tînin,

Bi saya wan prosesên mirov dikare bibêje agahî, zanêbûna heyî û çandî bandora xwe li xwendinê dikin. Helbet tiştêkî hewce ku divê neyê jibîrkirin û her tim di hişê mirov de be, adaptekirina materyalan li gorî tiştên pêwîst yê dersê ye ku ew materyalên nû bikaribin motîvasyonê xwendekaran zêde bike û hînbûna wan bi notên dersê re yekgirtî be. Diyar e ku di van salên dawî de li ser rola motîvasyonê di gelek rê û rêbazên hînkirina zimên de gelek kes tezan dinivîsîn û ji bona kurdî jî ev zehf elzem e.

Gazînen Xwendekaran

Gelek xwendekar ji nezanebûna peyvyan gazinan dikin û baweriya wan ew e ku çiqas zêde peyvyan bizanibin, ew ê zêdetir fehm bikin. Kesên ku peyvyan nizanin, deqên xwendinê wekî tekstên aciziyê bi nav dikin. Ev jî dibê sedema wendabûna motîvasyonê wan. Asta motîvasyonê û bihevregirêdana texmînkirina asta serkeftîbûna akademîk de kêrhatî ne (Baker & Wigfield, 1999: 452–477). Ji bona zêdekirina asta xwendekaran jî zanêbûna peyvyan ji bona bikaribin di navbera deqan de pêwendîya çêkin dê karê her du aliyan jî hêsantir bike.

Ev rewş di kurdî de jî dibe pirsgirêk

1. Cudahiyên peyvên herêmi dibe ku di pirtûkekê de li gorî zimanê herêmi hatiye nivîsîn bibe pirsgirêkek.

Mînak

Peyva “birçî û sibehî” li herêma Colemêrgê wekî “birsî û sipêde” tê gotin. Cudahiyên peyvên ne ji bona her kesî jî be ji bona gelek kesan dikare bibe sedema aciziyê.

2. Peyvên ku yan berê hebûn yan jî li gorî jiyana rojane ya niha hatine çêkirin, adaptekirin û afirandin jî di nivîsê de dikare bibe sedema aciziyê.

Mînak

Bikaranîna peyva “sarincê” di wateya bûzdolabê de dibe ku bibe pirsgirêk ji ber ku bikaranîna wê ya gundan cuda ye.

Mînak

Ji bona peyva “nexweşxaneyê” gelek kes peyva “xestexaneyê” bi kar tînin. Lê li herêma Rojhilat, berê peyva “xweşxaneyê” dihat bikaranîn. Ji bo qenehkirina zarokan ji bo birina wan a nexweşxaneyê ez bawer im, gava mirov bêje “em ê herin xweşxaneyê, ji bona tu xweş bibî” dê di warê rehetkirina derûniyê de jî çêtir be. Ev peyv di pirtûka *Fêrbûna Kurmancî* de cî digire. Li gelek herêman peyva “makîna cilan an jî ya firaqan” tê bikaranîn. Ji bona malbatên ku jixwe di jiyana rojana de kurmancî diaxivin guhertina peyvên zehmet e û dibe ku ne hewce jî be. Malbateke ku kurmancî diaxive dibe ku peyvên berê bidomîne û yê nû cilşo û firaqso jî bi kar neyîne.

2. Şiyana Xwendinê

Şiyanên xwendinê (Demirel, 1999: 134)

- a) Texmînkirina mijarê ji sernivîsan (predict)
- b) Pêşniyazkirina sernivîsekê ji bona deqekê ku hatiye xwendin (generalizing)
- c) Texmînkirina wateya peyvên deqên xwendî (guessing the meaning)
- d) Dîtina agahiyên gelemperî (surveying)
- e) Dîtina bidestxistina agahiyên taybet wekî zûnêrîn (scanning)
- f) Dîtina fikirên bingehîn û talî di nav deqên tînan xwendin de (finding the main ideas and supporting ideas)
- g) Transferkirina agahiyên deqan (Transferring the ideas)
- h) Derxistina kurteyên deqan (summarizing)

Ev stratejiyên ku mamosteyek dikare di hînkirin û bikaranîna deqên xwendinê de bi xwendekaran bide kirin zehf kêrhatî ne û bala xwendekaran bêtir dikişîne li ser dersê.

Taybetmendiya Deqên bîna Xwendinê

Armanca hînkirina xwendinê çi ye? (Demirel, 1999: 133)

- a) Bidestxistina şiyana xwendinê bi awayekî rast, berdewamî û bi fehmkirin
- b) Zêdekirina hejmara peyv
- c) Dîtina xwendinê wekî rêya agahî bidestxistinê
- d) Pêşxistina îfadekirina mirovan bi saya deqên bi zimanek rast û xweş hatine nivîsîn.
- e) Elimandina xwendinê

Heke zarok bikaribe di zimanekî de bixwîne, ew zarok dikare bixwîne û ev şiyana gelemperî dê di zimanekî din de xwendinê hêsantir bike (Krashen, 1996: 23). Wekî li jor jî xuya ye ev giş girêdayî hev in û xalek rê li ber tiştekî din vedike û di taliya talî de xwendin mêtîyê xwendakaran sistematîze dike. Herwiha mamoste jî divê ji xwendekarên xwe re bernamêyek bi rêk û pêk û li gorî heskirin û asta wan amade bike û van materyalan him ji bo dersan û him jî ji bona xebat û lêkolînê cuda bi kar bîne.

3. Hînkirina Xwendinê

Gelek sedem hene ku mirov deqên xwendinê bide hînkirin û di dersan de bi kar bîne. Mirov dikare xwendinê bo sedemên cûr be cûr bi kar bîne. Bi gelemperî mirov ji bo kêfê (hobî) an jî ji bona hînbûnê (agahî hînbûn) dixwîne (Grellet, 1987: 1-2). Sedemên bîngehîn ev in, lê mirov dikare hin sedemên din jî li wan zêde bike. Mirov dikare bibêje meraq, kêfgirtina xwendinê, pêwistiya agahiyekê û hwd. Armanca her çî be jî mirov nikare rojek bêxwendinê derbas bike, li her derê, her roj xwendin hewce ye ji bona ku mirov jiyana xwe bidomîne. Tu roj tune ye ku em peyamek, nivîsek, rojnameyek an jî lewhayek li ser rê nexwînin. Herwiha hemû pêvajoyên hînbûnê bi saya xwendinê rêk û pêk in. Ji ber vê jî her tim kesên ku dixwînin ne tenê di ware îfadekirinê de lê di warê analîz, fikir, plankirin û her tiştên girêdayî fikirî de jî jêhatî ne. Ev jî rê me dide ku xwendin di jiyana me de tiştekî jêneger e.

Ji ber vê jî pêwîst e em hînbûnê hêsantir bikin.

Xwendekar çiqas deqan bibînin, wê zanebûna wan a zimên pêş ve biçe û asta wan ber bi jor ve here. Mirov çiqas peyv, rêziman, biwêj, qalib û hevokan di nav deqan de bibînin, dê rêjeya hînbûnê zêde bibe û mirov bêhişmendî û bêstres, zimanê ku dixebite û dixwîne hîn bibe. Ji bona ku hînbûn serkeftî be, divê deq

bala xwendekaran bikîşîne, deq, mijar û peyvan di nav xwe de dubare bikin. Li vir rola xebat û çalakîyên zimên ji bo dubarekirinê pêwîst in.

Deqên xwendinê di heman demê de, ji bona hînbûna nivîsê jî modelên baş in. Dema ku em xwendekaran hîne xwendinê dikin, hewce ye ku em gelek deqan pêşkêşî xwendekaran bikin da ku gelek mijar bi awayekî xwezayî di hişê xwendekaran de cî bigirin.

Deqên xwendinê ji bona hînkirina peyv, rêziman, rastnivîs, hevoksaî, paragraf û sentaksan baş in. Ji bo vê nêrinê Penny Ur xwendinê wîha şirove dike (1996: 140):

“Tiştê herî balkêş divê di xwendinê de neyê jibîrkirin, xwendinê wekî tiştê bêdeng, şexsî û çalakîyêke pasîf an jî xebateke takekes nîne. Berevajî (bileks) em dikarin bi teşwîqkirina (handankirina) berawirdkirina deqên xwendekaran û bi şiroveyên xwendekaran dersê balkêştir û herikbartir bikin. Gava deqek biwate hebe, xwendekar dikevin nav meyla ku ew bi şiroveya xwe ya gelemperî li “şeweyê” (şikil) binêrin, lê ji dêvla vê, mirov bêtir em peyvên temamkêr ên li fehmkirina xwe ya deqê dinêrin”.

Gelek kesên ku li ser rol û bandora xwendinê xebitîne hene yek ji wan jî Krashen e. Xebatên wî bi gelemperî li ser tercîhên xwendekaran e. Ew jî tiştên kêfxweş dide hîlbijêr. Krashen di xebata xwe ya bi navê “The Power of the Reading” (Hêza Xwendinê) de bi gelemperî wekî ji nav jî diyar e behsa hêza xwendinê dike. Mijar çiqas balkêş û rengîn be, tercîha xwendina xwendekaran zêde dibe. Xebatên Krashen li ser xwendin û têkiliya wê bi hînbûna zimên re gelek in û angaştên wî jî xwendin ji şiyana herî kêrhatî ye. Ew di xebatên xwe de her tim dibêje ku pêşxistina zimên û zanebûnê bi xwendina azad û xwestekî ye. Bi ser de, wiha zêde dike; divê mirov tiştên ku dixwaze bi xwe hîlbijêre û bixwîne. Yê ku bi vî rengî gav neavêje tenê eşa xwendekaran zêde dikin, û yê din jî ji aliyê bi rêvebir û mamosteyan wekî kêfxweşî tê nirxandin. Zarokên temen (emir) mezintir di warê demê de li hemberî ciwanên din dema wan kêmtir e û tu hobyên wan tune ne, lê eleqeya wan a xwendinê bihêz dimîne (Krashen, 2001: 16). Xwendina biwate, ji bo me xwendinên ji ber sedema pêşxistina zimanê perwerdehiyê ne girîng in (Krashen, 2004: 150)

Hînkirin divê li gorî astan be da ku xwendekar bikaribin zanebûn, hînbûn û fehmkirina xwe zêde bikin û asta xwe ya gihiştina deqên teorîk zêde bikin. Bi gelemperî ev ast; sê astên ji hev cuda ne. Loma nêzikatiya her sê astan, çalakîyên wan jî ne wekhev in û baldarbûn tiştê girîng e.

3.1. Asta Destpêkê

Di asta destpêkê de, xwendin piştî ku mamoste ji hazirbûna xwendekaran bawer e ku dikarin hinek formên rêzimanê fehm bikin, cudahiya peyvan bibînin, rêgezên nivîs û bilêvkirinê bizanin dest pê dike. Di vê astê de mamoste hewl

dide ku *xwendina bi kontrol (controlled reading)* bi kar bîne. Yanî tekstên ku ji bo xwendekaran tîl hilbijartin, amadekirin an jî adaptekirin li gorî mijar û peyvên ku xwendekar hîn dibin divê bîlêvandin û bikaranîn. Ev jî carna ji bo mamosteyan dibe sedema alozî û dijiwariyan. Helbet mamoste dikarin *tekstên otantîk (xwezayî)* jî hilbijêrin û tiştên ku xwendekaran nedîtîbin bi kar binin. Tiştên nû di pevajo ya dersê de tîl hînkirin û li gorî pêwistiya demê tê veqetandin.

Wekî di angaştê me de hat îfadekirin, di van xebatan de mamoste dikare xebat û çalakiyên peyv û rêzimanê jî bi awayekî veşartî bi kar bîne. Di asta destpêkê de mamoste gelek caran ji bona kontrolkirina bilêvkirinê *xwendina bideng (reading aloud)* bi kar tîne da ku çewtiyên bilêvkirinê bibihîze û sererast bike. Heke mamoste bixwaze dikare pêşya xwendekaran bixwîne û ji bona xwendekaran bibe modelê. Ev rewş jî bona kesên ku dikarin kurmancî biaxivin lê nikarin bixwînin û binivîsînin ne pirsgirêk e. Ev jî bona kesên ku kurmancî wekî zimanê duduyan hîn dibin dibe mesele û alozî. Piştî xwendinê mamoste dikare ciyên ku wekî çewtî yan jî hewce ye xwendekar li ser xebateke dîsa dubare bike, dikare hinekî din jî wan bi hindekariyên cûr be cûr bide. Hindekariyên ku di vê astê de tîl dayî bi gelemperî yêl hêsan û kinik in, hindekariyên wekî *pirs- bersiv, hevyeckirin-a (peyv, hevok, agahiy), çewt û rast (Ç-R)* an jî pirsên fehmkirinê ne.

3.2. Asta Navîn

Deqên asta navîn li gorî asta destpêkê dijiwartir, hevok dirêjtir û hejmar û rêjeya peyvên zêdetir in. Ev jî wekî hindekariyê nû hindekariya *texmînkirinê (guessing)* di nav kontekstê de dide xwendekaran. Di asta destpêkê de, rola mamostayê/a bi gelemperî rênîşandan e, lê li vir bi gelemperî rola mamoste hêsaner (facilitator) e. Li gelek ciyan, mamoste wateya hevokê yan jî wateya peyvê ku di kontekstê de dikare biguhere ji xwendekaran re nabêje û kontrol dike gelo kî dikare bi perwerdehiya heyî bigihîje encamê. Bikaranîna *xwendina bideng* an *bêdeng* jî li gorî terciha mamoste ye. Tiştê herî balkêş di vê astê de heya jî destê mamoste tê jî xwendekaran gelek tiştan dipirse û wan bi her şîyanê dixê nav xebata îfadekirinê. Armanca mamoste dîtina fehmkirina xwendekaran û pêşveçûna asta wan e.

3.3. Asta Pêşketî

Asta pêşketî ji ber cûreyên hevokan, hejmara peyvên û îfadekirina dirêj asta herî tevlihev (komplîke) û bilind e. Ji ber vê çendê jî rengîniya deqan di her awayî de xwe nîşan dide. Di nav deqan de, peyvên naverokê, rêzimana heyî û yêl berî bi awayekî berawirdkirî, hêmanên çandî, nûçeyên rojane yan jî agahiyên teknolojîk, tenduristî, werzişî û hwd hene. Mirov dikare van agahiyan jî rojname, kovar, jûrnal (kovarên akademîk), çîrok, deqên edebî û akademîk û

hwd ve bigire. Di vê astê de, ji ber pêşveçûna asta xwendekaran xwendina bêdeng tê tercîhkirin. Helbet tiştên ku xwendekar wê nizanibin û nû bibînin hebin. Dîsa wekî asta navîn rola mamoste wekî *alîkar* û *hêsanker* e.

Asta xwende (karan/vanan) çî jî be ji bona peyvên ku nizanin, an na jê nebawer in, divê ferhengan bi kar binin, heta ku pekan be 3-4 cûre ferheng dê ji bo wan zehf baş be. Di beşa hînkirina peyvan de cudahiyên ferhengên niha hatibû behskirin (bnr. r.27) Ji bona bikaranîna ferhengê jî Penny Urr dibêje helbet lazim e ku xwendevan bizanibin ferheng çawa tê bikaranîn, lê gerek ew bizanibin kengî lazim e mirov li ferhengê binêre ji ber ku texmînên entellektuêl jî pêwîst in. Ferheng ji bona pejirandin an nepejirandina texmînên mirovan wekî amrazek li gorî fehmkirina deqê bêtir tê bikaranîn (1996: 149).

Di her sê astan de tiştêkî ku mamoste divê baldar be, hîlbijartina deqên ku dê di dersê de bîn bikaranîn. Ji ber ku di hîlbijartina wan de asta xwendekaran, eleqeya wan, balkêşbûna wan zehf girîng in.

4. Pêşkêşkirina Çalakiyeke Xwendinê

Bi gelemperî pêşkêşkirin bi sê serenavan de çê dibe. Jê re jî dibêjin xwendina *nêzikatiya sê-pêvajo*.

Prosesa fehmkirinê pêşiya em dest bi “*xwendinê*” bikin dest pê dike û piştî “*xwendin*” diqede jî didome. Xwendevanên baş stratejiyên wekî *pêşînêrîna (previewing)* deqê û stratejiyên piştî xwendinê wekî derxistina kurteyan ji bilî gelek stratejiyên dema “*xwendinê*” bi kar tînin. Xebata xwendinê wekî sê perçeyan in; pêşiya-xwendinê, dema-xwendinê û piştî xwendinê, mamoste dikarin çalakiyan ji bona her astê amade bikin ku ev jî fehmkirina xwendekaran dê zêde bike û derfetan bide mamosteyan ku bikaribin di her astê de stratejiyên ku xwendevan bikaribin hînbûna xwe nîşan bidin bibînin (Pardo, 2004: 272 - 281).

4.1. Pêşiya Xwendinê

Armanc ev in:

- Danasîna mijarê
- Motîvekirina xwendekaran
- Amadekirina perwerdekirina zimên
- Dîtinê zanebûna xwendekaran li ser mijarê û nasîna wan a mijarê
- Pêşkêşkirina mijarê
- Alîkariya stratejiyên xwendinê
- Behskirina serenav, mijar, bûyer û serpêhatiyên mijarê
- Şiroveya wêne û xêzikan

- Balkişandina xwendekaran li ser peyvên nû yên dersê.

4.2. Dema Xwendinê

Armanca xebat û çalakiyên dema xwendinê wiha ne:

- Fehmkirina niyet û armanca xwendekaran.
- Alîkariya fehmkirina avasaziya deqê û organizasyona deqan.
- Zelalkirina naveroka deqê.
- Di warê nêrîna peyvên nediyar de alîkirina xwendekaran
- Fehmkirina fikra bingeîn ya deqê.
- Lêgerîna gelemperî.
- Lêgerîna taybet.
- Bersivîn û bersivdîtina pirsan.
- Temamkirina grafik û nexşeyan.
- Çêkirina listeyan.
- Nîşegirtina peyamên girîng yên deqê.

4.3. Piştî Xwendinê

- Armanca xebat û çalakiyan wiha ne:
- Bihêztirkirina tişte ku hatiye xwendin.
- Pêwendî çêkirina deq û jîyana xwendekaran / şexsîkirin.
- Bikaranîna tiştên xwendî.
- Bikaranîna metodên hînbûnê ji bona zimanên din.
- Bikaranîna teoriyên ku hatine hînkirin.
- Bikaranîna şiyana xwendinê ji bona pêşxistina şiyanên zimên ên din.
- Alîkariya entegrekirina çandên biyanî.
- Bikaranîna peyv û avasaziyan ji bo nivîsên kontrolkirî
- Bersivandina hin pirsan
- Senifandina agahiyan
- Çêkirina pêşnûmayan (outline)
- Nirxandin û şîrovekirina hin xalên xwendinê
- Listina listikên polê.

Mirov nikare van pêvajoyan ji xebat û pirtûkan cihê bigire û serbixwe ji bi kar bîne. Hewce ye ku mirov bikare xebat û çalakiyan ku bi kar bîne û divê dersên

hatine çêkirin bi dersên ku berê hatine çêkirin re hev girtî bin û xwendekar bikare têkiliya mijarên berê û yên nû têkildarî hev bin. Ev xebat carna wekî dubarekirin an jî hînbûna mijaran e jî. Her xebat divê li gorî asta xwendekaran be. Bi saya vana, tiştê herî xwezayî zêdekirina motîvasyonê xwendekaran e. Dema mirov van her sê pêvajoyan bi kar bîne hebûna çalakiyên wekî axaftin, guhdarîkirin û nivîsîn rengîniyekê dixê dersê û monotoniya heyî jî dişkîne. “Motîvasyon xwejenere ye û bi xwendekaran re derdikeve holê; mirov nikare motîvasyonê bide xwendekarekê/an” (Lyons, 2003, 77).

5. Stratejiyên Xwendinê

Stratejiyên xwendinê yên gelemperî wiha ne (FSR, 2004: 10)³

| Stratejiyên gelemperî yên xwendinê | Şayesandin – pênasekirin |
|---|--|
| Texmînkirin Predicting | Alîkariya agahiyên berê dike, girêdayî wêne, sereke û hwd in. |
| Girêdan (pêwendîçêkirin) Connecting | agahiyên berê û yên nû digihîne hev |
| Berawirdkirin Comparing | Li ser cudahiya di navbera du tiştan de disekine |
| Encamkirin Inferring | Li gorî tiştên tîn xwendin di asta edebî de tîn şîrovekirin |
| Sentezkirin Synthesising | Şopandina agahiyên perçe ji bona fehmkirinê |
| Perçe-wêne çêkirin Creating Images | Ji bona fehmkirina tevahiya deqê alîkariya wênegirtinê. |
| Xwe-pirsiyarî Self-questioning | Ji bona hînbûna aktîf dayîna çarçoveyek da ku xwendekar bikaribin deqê bi bersivan girê bidin. |
| Zûnêrîn Skimming | Ji bona fehmkirina gelemperî zûnêrîna deqê |
| Hûrnêrîn Scanning | Ji bona bidestxistin û ditîna agahiyên hurgilî wekî dem, dîrok, nav û hwd. |
| Diyarkirina girîngiyê Determining Importance | 1) pêşxistina agahiyên herî girîng di nav qalib, hevok, paragraf, beş, novel an jî di tevahîya nivîsê de |

Tablo 3.1 Stratejiyên Xwendinê

³ Ji pirtûka *First Steps Reading Resource Bookê* hatiye adaptekirin.

Cûreyên Xwendinê

Li ser cûreyên deqên xwendinê gelek nîqaş hene û hê jî yên nû dikarin derkevin pêşiya me. Teqez hîlbijartina deqan girêdayî asta xwendekaran e, mijarên ku wê bîn pêşkêşkirin û eleqeya xwendekaran bikşînin do motîvasyon û pêvajoya hînbûna xwendekaran de roleke mezin dilîzîn. Mamoste li gorî paşxan û fehmkirina xwe li gorî pêwîstiyên xwendekaran jî dikare deqan hîlbijêre û temayên ku pêşkêşî xwendekaran kiriye di nav xebatên xwendinê de bi hev re girê bide û hevgerîbûna mijaran kontrol bike.

Yek nîqaşa girîng û balkêş bikaranîna deqên “orjînal” in. Ji ber ku di deqên orjînal de her cûre hevok, biwêj, qalip an jî rêziman bêpergal tînin dayîn, ev rewş dibe sedema pirsgerêk û aloziyan. Bo çareserkerîna jî gelek mamoste deqa ewil û orjînal diguherînin û asta hevokan li gorî asta xwendekaran ji nû ve çêdikin. Herwiha heke ji bona pola destpêkê yan jî pola ewil, mirov rojnameyên wekî “*Welat*” an jî “*Tîgrîs*”ê yan jî malperên nûçeyan mîna “*Rûdaw*”ê bi kar bîne wê ev hewldana xebata xwendinê tenê bibe sedema wendakirina demê û wê xwendekar tiştêkî jî ji xwendinê fehm neke. Gelek peyvên nû ku ji asta wan bilindtir û rêzimana ku ji asta wan diwartir di nav pirtûk an materyalan de derkeve pêşiya wan. Di van deqên xwendinê de ku wê ji bo dersê bîn bikaranînin divê hevsengiya agahiyan û zanebûna xwendekaran hebe. Mirov dikare ji xwendekarên asta despêkê, deqên hêsan û rehet wekî çîrok, çîrçîrok, stran, helbestên kin û hêsan an jî hin bername û hwd amade bike û xwendekar jî ji wî tiştî sûdê bigirin. Lê divê mamoste/a ti car stran û helbestên giran ku di nav wan de gelek peyv û rêzimana diwartirê asta xwendekaran hebe bi kar neyîne da ku hevesa xwendekaran bo hînbûnê neşkê.

Carna polên mamosteyan dibin polên asta tevlihev ku wê demê jî karê mamoste zêde û zehmet dibe. Hewla mamoste ku bikaribe xwendekarên polê gişî dilşad û kêfxweş bike zehf zor e û bi gelemperî jî xwendekar ji dersan kêfxweş nabin û dev ji hînbûnê berdidin. Ji bona van rewşan jî, divê xwendekarên asta wan kêmtir in hewce ye bêtir bixwînin û peyvan hîn bibin, dersên ku di polê de dibînin hercar dubare bikin, berî û piştî dersan amadekariyên xwe bê navber bidomînin.

Ji bo polên tevlihev, divê mamoste her car li nêzîkatiyên xwendekaran jî baldar bin. Xwendekarên ku asta wan bilind in dema ku hîs dikin tiştêkî hîn nabin aciz dibin û di nav xwe de hîsên neyînî dijîn. Ji bona van rewşan jî divê mamoste di her dersê de teqez peyvên nû bide, xebatên cûr be cûr pêk bîne ku xwendekar her tim di nav derûniya hînbûnê de bin.

Rêza Xwendinê

- Berê mijar tê pêşkêşkirin.
- Mamoste pirsên di derheqê deqê de ji xwendekaran dipirse.

- Balkêşbûna mijarê ji bo xwendekaran û herikbariya dersê girîng e.
- Asta deqê divê di asta xwendekaran de be, ne be wê fehmkirin ne baş be.
- Ders bi xwendina deqê dest pê dike û mamoste carna bi pirsan carna bi wergerê û carna jî bi cudahiya çandan yan jî bi awayekî din naveroka xwendinê vedikole û nerînek hûrgilî derdixe holê.

Li ser xwendinê, Krashen gelek xebat kirine û gelek pêşniyazên wî hene; hinek wiha ne: Brevajî perwerdekar çî bifikirin jî, divê xwendin “serbest” û dilxwazî” be û ew vî tiştî bi navê xwendina dilxwaz a serbest bi nav dike. Îngilîziya wê “*Free Voluntary Reading*”⁴ e.

Krashen fikrên xwe wiha pêşkêş dike:

“Xebateke din nîşan dide ku xwendevan ezmûnên peyvan derbas dibin, lê kesên ne xwendevan derbas nabin (2004: 18), loma hînkirina listeyên peyvan karîger (bi bandor, efektîv) e, heke mamoste vê demê ji bona xwendinê xerc bike çêtir e” (h.b. 2004: 19).

Çawa ku kesên sedî sed vê angaştê rast bifikirin hebin jî, dê kesên vî tiştî red bikin jî li hemberî wan derkevin. Di beşa peyvînkirinê de, di binbeşa bikaranîna listeyên peyvan de, behsa cudahiya kesan hatibû kirin, em li vê derê dixwazin bi bîr bixin ku ev tişt li gorî kesan diguhere û em li hemberî fikra Krashen in, ji ber ku kêfa hin kesan ji xwendinê, ya hin kesan jî ji listeyan tên. Tercîha xebatên hînbûna peyvan li gorî kesan diguherin.

“Dema xwendevanên zimanê duduyan, ji bo kêfê dixwînin, bê ders, bê mamoste, bê xebat heta bê kesên ku bi wan re biaxivin hebin jî, ew dikarin pêşxistina zimanê xwe ya duduyan bidomînin (Krashen, 2004: 147). Helbet ji bona serkeftîbûna bernameyeke bi vî rengî lazim e ku xwendevan bernameyeke bi kontrol pêk bîne, gelek kes bi hêsanî ji bo xebatên demdirêj motîve nabin û bala wan zû bela dibe, ji ber vê çendê jî mirov bi xwe vênêrînerê xwe ne.

Di pêvajoya hînbûnê de, dema xwendekar xwediyê derfeta gelek xwendinan be, dest bi fehmkirinek zêdetir dike û deq ji bo wan hêsan dibe. Xwendinên gelek caran ji bona deqên dijwar alîkariya herikbariya xwendekaran dikin (Pikulski, 1999: 147). Mirov dikare ji kesên derdora xwe jî bibîne; kesên ku pir dixwînin, di warê gelek tiştan de wekî axaftin, fikirin, xwe-îfadekirin, nêzikatî û lêpîrsîna bûyeran, hîlbijartina peyvan û hwd de ji yê nexwende cuda ne.

Li gorî Mc Kenna & Stahl⁵ (2009: 148) sê hêmanên xwendina herikbariyê hene:

- Nasîna peyvên rastîn

⁴ <http://lmp.ucla.edu>

⁵ <http://literacyreferenceproject6.weebly.com/fluency.html>

- Otomotîkbûn
- Rîtmâ rastîn (yekgirtî; appropriate) û întonasyona axaftinê

Herwiha, daneyên lêkolînan nîşan didin ku zanîna peyvan teqez bi xwendinên Z2yan yên di asta bilind re girêdayî ne (Chung & Nation, 2003; Davis, 1944; Grabe & Stoller, 2002; Laufer & Sim, 1985).

6. Analîza Pirtûkên Kurmancî

Wekî tê zanîn kêmbûna sazî, dibistan û enstîtuyan tê wateya hindikbûna pirtûkan. Xebatên heyî piranî tevgerên şexsî yan jî yên sazîyekê ne. Ji ber ku perwerdehîyeke gelemperî tune ye, mirov an jî hinek sazî hewl didin li gorî xwe pirtukan çap bikin. Ji bo hînkirina Kurmancî li bakûr, hejmara pirtûkan ne zêde ye, yên ku tên zanîn *Pirtûka Destpêkê* (Weşanên Edubba), *Gav bi gav Kurmancî* (Weşanên Sîtav), *Mamoste* (Zanîngeha Mardin Artukluyê) û *Hînger* (Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê) in û hinek pirtûkên ku din jî hene ku me cî ne da wan ji ber ku di wan de qet deqên xwendinê tune ne lê tenê li ser diyalog, hevok û hîndekeyên hevokan hûr bûnê. Ji bilî wan jî pirtûkên Michael Chyet (em fêrî Kurdî dibin) û ya Resul Geyik (Fêrbûna Kurmancî) ji ber ku nehatine çapkirin, ew pirtûk nehatin nirxandin.

Ev pirtûk ji ber bandora sîstema perwerdehîya tirkîyeyê hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê rê û rêbazan bi awayekî xwezayî dişibin yên tirkî. Naverok divê li gorî ast û li gorî temenê xwendekaran divê bê amadekirin. Ji aliyê rê û rêbazan ve jî, li tirkîyeyê hînkirina zimanan li ser hînkirina rêzimanê hatiye avakirin, ev jî bêhemdî dibe modela pirtûkên kurmancî jî, loma gelek nivîskar an mamoste dema pirtûkekê binivîsin bê hemdî û ji ber hînbûnên gelemperî pirtûkên wan dişibin pirtûkên tirkî.

Dema em li hesmakara deqên xwendin û diyalogên pirtûkan dinêrin

| Navê pirtûkê | Hejmara deqan |
|--------------------|---------------|
| Gav bi Gav Kurdî 1 | 13 |
| Pirtûka Destpêkê | 23 |
| Mamoste 1 | 16 |
| Hînger 1 | 15 |
| Hînger 2 | 47 |
| Hînger 3 | 53 |

Helbet hejmara xwendinê li gorî astan diguherin, di asta destpêkê kêmtirin, her çiqas asta xwendekaran zêde dibe hejmara deqên xwendinê jî zêde dibin. Hinek pirtûkên jor ji dêvla bikaranîna deqan bikaranîna diyalogan tercîh kirine. Ev jî bi armanca hînkirina şîyana axaftinê ye. Xuya ye ku mamoste û pirtûk di destpêka hînkirina zimên de, şîyana xwendinê zêde nayê bikaranîn. Herwiha dema asta

xwendekaran zêde dibe, rêjeya deqên xwendinê jî zêde dibin. Hewce ye li gorî astan deqên kurt bîn amadekirin ku mijar, peyv an jî rêziman di nav konteksta xwendinê de bê dayîn.

Wekî tê dîtin di nav wan de hînkir ji ber ku rêze pirtûke asta xwendinê him bi him zêde dibe. Xebatek lêkolînê ku Kurt pêk anîye şîroveya bikaranîna xwendinê wiha îfade dike (2015: 118)

-Ji bo xala “Pirtûk têra xwe girîngiyê dide şîyanweriya xwendinê.”, %5,0ê mamosteyan “qet ne rast e”, %15,0ê wan “ne rast e”, %50,0ê wan “piçek rast e”, û %30,0ê wan “rast e” nîşan kirine. Lê tu xwendekaran “teqez rast e” nîşan nekiriye. Navinciya arîtmîk ya vê xalê $X = 3,05$ e. Ev nirx nîşan dide ku navinciya bersivên mamosteyan li derûdora “Piçek rast e” ye. Dikare bê gotin ku li gorî fikrên mamosteyan Hînkir têra xwe girîngiyê dide şîyanweriya xwendinê.

Nirxandin

Hebûna deqekê, hînkirina peyv û rêzimanê hêsantir dike û ji ber ku di deqê de behsa bûyerekê tê kirin, peyv û rêziman di hişê mirov de dimînin. Bi rastî hînkirina peyv û rêzimanê him di Z1 û him di Z2yan de dijwar e. Bikaranîna deqekê alîkariya xwendekaran dike ku avasaziyên zimên bi rehetî hîn bibin û bi kar bînin. Heta ku peyv û rêzimana ku hatiye hînkirin ne tenê di nav deqekê de lê di nav du yan sê yan jî diyalogên cuda de bin, xwendekar dê wana bi awayekî hêsantir hîn bibin. Wekî di şîyanên din de jî xuya ye hebûna konteksê di xwendin û nivîsê de jî girîng e. Wekî Hyland (2002:78) dibêje: Di bingeha xwe de, nivîsîn tê hînbûn ji dêvla hînkirinê, û metoda herî baş a mamosteyan jî piştgirî û rehetîya ku dide ye. Peyama veşartî ku Hyland dide, dijiwariya destpêka xebatên nivîsê ye, xwendekar bi tena serê xwe nikarin serkeftî bibin. Mamoste divê karê xwendekaran siviktir bike û piştgiriyê bide wan ku motîvasiyona xwendekaran zêde bibe û otonomiya serbixwe jî di her pêvajoya dersê de bi kar bînin.

Çavkanî

- Baker, L., û Wigfield, A. (1999). “Dimensions of Children’s Motivation for Reading and Their Relations to Reading Activity and Reading Achievement”. *Kovara Reading Research Quarterly*, hej. 34.
- Chung, X., & Nation, I. S. P. (2003). “Technical Vocabulary in Specialised Texts”. *Reading in a Foreign Language*, Hej.15, 103–116.
- Clay, M. M. (2002). *An Observation Survey of Early Literacy Achievement*. Portsmouth: Heinemann Publishing.
- Davis, F. (1944). *Fundamental Factors of Comprehension in Reading*. Psychometrika Publishing, 9, 185–197.
- Demirel, Ö., (1999). *Yabancı Dil Öğretimi*, Stenbol: MEB Yayınları.
- Grabe, W., & Stoller, F. (2002). *Teaching and Research Reading*. Harlow, UK: Longman.

- Grellet, F., (1981). *Developing Reading Skills*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Hedge, T., (2000). *Teaching and Learning in the Classroom*, Oxford: Oxford University Press.
- Hyland, K. (2002) *Teaching and Researching Writing*, New York, Longman Press.
- Krashen, S.D., (2001). *Do Teenagers Like to Read? Yes! USA: Reading Today PRESS*.
- Krashen, S. D., (2004). *The Power of Reading: Insights from the Research*. Libraries Unlimited Press, Çapa Duduyan, Connecticut and London
- Kurt, Ş., (2015). *Nirxandîna Pirtûka Hînkirina Kurdî: Hînkêr -Li Gorî Nêrînên Xwendekar û Mamosteyan. Şwr: Doç.Dr. Tahirhan Aydın, Zaningeha Mardin Artukluyê, Teza mastirê nehatîye çapkirin*.
- Laufer, B., & Sim, D. (1985). "Measuring and Explaining the Reading Threshold Needed for English for Academic Purposes Texts". *Foreign Language Annals*, hej.18, 405–411.
- McDonough, Jo & Christopher, S., (2003). "Materials and Methods in ELT: A Teacher's Guide", New Jersey: Blackwell Publishing,.
- McKenna, M.C. and Stahl, K. A. D. (2009). *Assessment for Reading Instruction (çapa duduya.)*. New York: Guilford Publishing.
- Nation, P. & J. Coady. (1988). "Vocabulary in Reading" di edt. R.Carter & m. McCarthy. r. 97 – 110
- Pardo, L. (2004). "What Every Teacher Needs to Know About Comprehension". Di kovara *The Reading Teacher*. 272-281.
- Weaver, C., (2009). *Reading Process*. Portsmouth NH: Heinemann Publishing.
- Ur, P., (1996). "A Course in Language Teaching: Practice and Theory", Cambridge: Cambridge University Press.



Makale Geliş Tarihi: 16.09.2018

Makale Kabul Tarihi: 10.12.2018

SOME GŪRĀNĪ GLEANINGS FROM PERSIAN CODICES*

Mustafa Dehqan¹

ABSTRACT

A search in the archives and rare collections of the National Library, Tehran, intended primarily to find the Arabic polemics against Yezidi religion, has resulted in the discovery of another source of information on the Gūrānī literature. To my knowledge, this collection has never previously appeared in print. It contains some Persian codices, entitled, *jung* in which there are unpublished material of the Gūrānī literature. Most of the Persian material given in the *jungs* were considered by Library's staff. However, they chose not to give details on Gūrānī fragments, and the fact that this material exists has largely been ignored by scholars up to the present day. This paper gives a presentation of this Gūrānī unpublished material, making it widely available for the first time.

Key words: Gūrānī, Persian, Kurdish, Kurdistan, *jung*, codices, Iran

ÖZET

Fars Elyazmalarında Bazı Goranî Derlemeleri

Tahran'daki Ulusal Kütüphane arşivlerinde ve nadir koleksiyonlarındaki bir araştırmada temel amacım Yezidi dinine karşı yazılan Arapça tartışmaları bulmaktı, fakat sonunda Gorani edebiyatı hakkındaki yeni bir bilgi kaynağı keşfettim. Bildiğim kadarıyla bu derleme daha önce herhangi bir yerde yayınlanmadı. Derlemede *jung* adı verilen ve Gorani edebiyatının yayınlanmayan malzemelerini içeren bazı elyazmaları mevcut. Elyazmalarında yer alan Farça materyalin çoğu kütüphane çalışanları tarafından kaydedilmişti, fakat Gorani parçaların paylaşımındaki kapalı tutumlarından dolayı bu malzemenin varlığı günümüze kadar bilinmemekteydi. Bu makale Gorani edebiyatının bu yayınlanmayan malzemelerinin tanıtımını yaparak onları geniş kesimlerin kullanımına sunmaktadır

Anahtar Kelimeler: Gorani, Farsça, Kürtçe, Kürdistan, *jung*, elyazmaları, İran

* I am grateful to Behrooz Chaman Ara, Philip G. Kreyenbroek, and Farangis Ghaderi for comments on an earlier draft of this paper. None of them should be held responsible for what is expressed here.

¹ Dr., mustafadehqan@yahoo.com

KURTE

Hinek Berhevokên Goranî di Destxetên Farisî de

Li Pirtûkxaneyê Neteweyî ya li Tehranê armanca min a sereke ew bû ku li arşiv û koleksiyonên kêmpêyda de nîqaşên bi erebî yên li hember dîne êzidî hatine nivîsîn peyda bikim. Lê di encamê de min çavkaniyeke nû ya edebyata Goranî peyda kir. Ya ez dizanim ew berhevok heta niha li çî cihan nehatiye çapkirin. Di berhevokê de hinek destxetên edebiyata Goranî yên neçapkirî hene ku wek *jung* têne binavkirin. Piraniya malzemeyên bi farisî yên di desxetan de ji aliyê xebatkarên pirtûkxaneyê hatine tomarkirin, lê bele ji ber ku destgirtî bûn ji bo parvekirina parçeyên bi goranî, ew malzeme heta niha nedihatine zanîn. Ev gotar hewl dide ku wan malzemeyên neçapkirî yên edebyata Goranî bide nasîn û wan peşkeş bike ji bo bikaranîna raya giştî.

Peyvên Sereke: Goranî, Farisî, Kurdî, Kurdistan, Jung, Destxet, Îran

Introduction

Classical Gūrānī literature rests upon a rich heritage of written tradition. The major dialects of Gūrānī with approximately three hundreds famous manuscripts altogether (including those outside Iranian and Iraqī Kurdistan), possess a wealth of literature, unfortunately mostly unstudied, marginalized, and known to few². Talking about Gūrānī literature, you are often forced into a discussion on ‘unpublished material’. Much of the Gūrānī literature is channeled through personal libraries, in the canonical as well as in the noncanonical, in the unedited and unstudied formats. Mining the unknown and unpublished Gūrānī literature is the most important way to introduce its treasures to a broader public³.

That Persian literary compositions, known as *jung*⁴, despite the unworldly nature of much of their content, could prove to be significant source material for such practical matter as Gūrānī poetry, has been known a long time, ever since the text of some Gūrānī hymns was edited and published some decades ago⁵. When therefore the theme of this issue was announced, it occurred to me that it might be useful to search through all, or at least some, of the available unpublished Persian *jungs* with an eye for those fragments that have some relevance for Gūrānī literature. This paper will present a glimpse into the results of this search. The allusions to and quotations from Gūrānī poetry in Persian literary compositions or *jungs* have not yet been systematically collected and analyzed; this paper, therefore, aims to illustrate the inherent interest of this tradition and its significance in reconstructing the multilateral picture of Gūrānī literature.

*I am grateful to Behrooz Chaman Ara, Philip G. Kreyenbroek, and Farangis Ghaderi for comments on an earlier draft of this paper. None of them should be held responsible for what is expressed here.

² The Gūrānī literary tradition, in general, is rightly tackled by Blau (1989). The Gūrānī varieties have been studied by Hadank (1930) and MacKenzie (1956, 1966).

³ The earliest important works on Gūrānī grammar and literature were published by Rieu (1881) and Soane (1921). Of new studies one may mention the work by Chaman Ara (2015), with a special focus on Gūrānī epic texts.

⁴ *jung* (also known as *safîna*) is a literary miscellany of prose and poetry, and sometimes album of pictures and illustrations. For some details on *jungs*, see Afshār (1982).

⁵ Compare Minorsky (1943) and MacKenzie (1965).

A few number of Persian *jungs*, however, came to be linked with Gūrānī Literature. These codices are recently purchased from Kurdish individuals⁶. While the depository of the following Persian codices are subject to scholarly debate, the fragments discussed below probably originated in western Iran during the 19th to 20th centuries. Some of the folios show traces of a later revision. The date of all Gūrānī fragments given in the Persian codices is difficult to ascertain, though there are some dated pieces and colophons. While the Gūrānī poems have normally been ascribed to certain authors, such claims sometimes lack scholarly support. Some Arabic and Turkish prose and poetries are also found, as well as later Persian glosses. At some point after these codices were made, the Gūrānī texts were damaged and consequently, the possible variants need to be employed to reconstruct lost words and passages. Some lines of the manuscripts have been damaged by recent bindings and restorations.

The manuscripts discussed below include some important Gūrānī poems and texts, which are, to my knowledge, absent from available Gūrānī texts. The following list of manuscripts is the result of the compilation of chronologically heterogeneous materials. The five main codices concerning Gūrānī literature are:

MS 1330041

Jung-i Ash'ār-i Gūnāgūn (Bayād-i Majmū'a); dated 1248 AH/1832 CE; 148 fols.; various lines; 85 x 185 mm.; *Farangī, Nukhudī* paper; brown leather hardcover

The copyist was a Kurd from Saqiz in Iranian Kurdistan, named Muḥammad Jadīd, who wrote the name and dating of the codex in fols. 45r., 104v., and 144v. (normally as *tammāt shud az dast-i Muḥammad*). The codex is valuable in its own right because of its being written by a Kurd from, Saqiz, a Kurdish-Sōrānī speaking area (fol.1r.), which makes it unique, unlike Gūrānī folios that are produced massively. Among all known Kurdish manuscripts in current collections, those coming from the Sōrānī Kurdish areas are clearly the rarest. If none of the poems given in the codex ever was Sōrānī, it is all the more interesting that the incipit (*min xane xirab bûm le qem-i iŝq-i cūanan ▪ piyweste dekîŝim qem û hicran û feqanan*, fol.1v.) and excipit (*derd-i gyan dadin sextewe*, fol.129r.) present Sōrānī fragments.

